Azadiya
WELAT
Rojnameya Hefteyî
32
SAL: 1
8 - 14 Rezber 1996
BUHA: 75.000 TL



Serokê Enstîtuya Kurdî Şefik Beyaz:

Jiyaneke paqij hatiye afirandin

Ew girtîgehên ku însanên PKK'yî tê de ne, jiyana welatparêzî li wir jî heye, wekî derve. Belkî ji derve jî çêtir heye. Jiyaneke rêxistî ye, jiyaneke paqij e. Di wê jiyanê de mirov hewayeke paqij distîne. Mirov her dem, her saniye xwe nû dike, wê îmkan û derfetê dibîne.

Vêga li pêş me projeya herî mezin wek hazirkirina ferhengeke mezin dixuye. Ferhengên ku heta vêga hatine hazirkirin, mirov nikare ji wan re bibêje akademîk in. Hema bi giştî mirov dikare bibêje ku peyv berhev kirine. Ferheng, ne peyv berhevkirin e. Ji bo hazirkirina ferhengê em dixwazin ji parçeyên din ên Kurdistanê bi vî karî re eleqedar însanên akademîk bînin vê derê. Ev xebat belkî di demeke dirêj de pêk were, em lê dixebitin ku zûtir çêbe.

Rûpel 8-9

- **"Bila canê dewleta min sax be!"** A. MELİK FIRAT**, bi vê nivîsa xwe li ser derbeya leşkerî ya 12'ê Rezberê disekine û Kenan Evren û Süleyman Demirel dide ber hev.** Rûpel 16–15
- AMED TÎGRÎS **bi sernava "Dostê dijmin û dijminên gelê kurd", dijminiya kurdan a bi hev re dikole.** Rûpel 7
- **"Mirov bi mafên xwe dibin mirov"** CELALETTİN YÖYLER **di nivîsa xwe de, ji aliyê îslamî ve "maf" dinirxîne û balê dikişîne ser rewşa gelê kurd.** Rûpel 5

www.kurdi.org

NAVEROK



4

Dîlawer: Çeşnên hunerê û di têkoşînan de rola wan



6

F. Kurêşivan: Bila alfabeyeke neteweyî bê amadekirin



10

Dildar Şeko: Kedkarekî şoreşê; Seydayê Tîrêj

Ji Xwendevanan

Gelê kurd bi sedsalan e ku di bin darê zilm û zorê de dijî. Feqîr û xizan e; belengaz û şerpeze ye, lê bele tim jî bi hesreta welatekî serbixwe û azad maye.

Evîn û hesret bûne wekî du destbirakan di dilê gelê kurd de dijîn, şitl û şaxên xwe kûr berdane nav dil û hinavan. Evîndarî ne hêsan e. Evîn geh mirov dikuje, geh dikelîne, lê dîsa jî mirov dest ji evîna xwe bernade.

Gelê kurd evîndarê welat e, ji bo wê evînê çi maye ku nekiriye û çi maye ku bi serî de nehatiye; ne kuştin, ne koçberî û sirgûn û ne îşkence û lêdan ew ji vê evînê dûr xistiye. Her di dilê wî de maye û wê bimîne jî.

REMEZANÊ HÛRÎ

EV xebata ku hûn di bin hemû zilm û zordestiya dijmin de dimeşînin, em pê serfirnaz dibin.

Em hêvî dikin ku roj û salên li peşiya me bibin roj û salên aştiyê, azadiyê û serxwebûnê. Di xebat û karên we de em serkeftinê dixwazin.

SEYFEDÎN GIRTÎGEHA BÎRECIKÊ

***EZ** bi rojnameya ku bi zimanê me tê weşandin, gelekî kêfxweş dibim.*

Bi alîkariya wê ez gelekî baş fêrî zimanê dayika xwe bûm. Hûn rojname û kovar bi zimanê gelê xwe derdixin, li gelê xwe xwedî derdikevin, ez ji ber vê jî pir şad im. Ez êdî nizanim çi bibêjim.

BAWER YÖYLER/ STENBOL

Kuştina fersendan

MEHMET GEMSİZ

Me di vê sedsalê de sê fersendên girîng bi dest xistin, ji bo avakirina dewleteke kurdî. A pêşîn di dema Şêx Mehmûdê Berzencî de, ya diduyan di dema Qazî Mihemed de û ya sêyemîn jî, li başûrê welêt di sala 1991'ê de.

Ev her sê qonaxên dîrokî zêde nedomiyan û hêvî şikiyan. Ew heba bûn, çûn.

Li Başûr qet nebe mercên federasyoneke demokratîk ji bo kurdan peyda bûbû, lê ev penc sal e ku tu statuyek ji bo kurdan çênebûye.

Niha jî li Başûr, tevliheviyek, geremolek heye. Hêz û partiyên başûrî wekî ku benikên dû hebanê bin, siyaset û dîplomasiyê dikin. Di encama van tiştan de em dibînin ku li başûrê welêt, kurd ne ji bo xwe, ji bo xelkê fişekên tivingan in û ne leşkerê xwe ne.

Vê rewşa dawî ya li başûrê welêt ev tişt bi me dan gotin.

Barzanî bi alîkariya Iraqê Hewlêr îşgal kir, gelek kes kuştin û pir kes jî dîl girtin. Hûn bala xwe bidinê, îcar qesabê kurdan Saddam jî alî Berzanî dike û li hemberî Telabanî şer dike.

Berzanî sedemê vê yekê wiha diyar dike "Telabanî jî bi Îranê re li me dixist."

Berzanî ji Tirkiyeyê jî alîkarî dixwaze. Dibêje ku PKK jê re bi xetere ye.

Amerîka jî bi moşekan (fuzeyan) li başûrê Iraqê da, pê re jî sînorê başûrê Iraqê berfirehtir kir. Ji parelela 32'yan derxiste 33'yan. Ev dever ji firîna balefirên Saddam re qedexe ye. Xwedêgiravê Amerîkayê jî alî kurdan kir. Saddam bi pêşmergeyên Berzanî re Hewlêr dagir kir, Amerîka jî diçe çolên başûrê Iraqê bi moşekan dihingêve, dikute.

Sînorê başûrê Kurdistanê jî wekî berê hişt. De êdî hûn bifikirin!

Her dewlet li gorî berjewendiyên xwe di warê siyaset û dîplomasiyê de cih distîne. Bill Clinton jî, ji bo hesabên xwe yên hilbijartinê bi ser Saddam de çû... Mebest ne parastina kurdan e...

Kurdan, li her derê Kurdistanê êş kişandine, talan bûne, tajan bûne. Koçberî, perîşanî, tengezarî û qetlîam dîtine.

Li başûrê welêt tiştekî din jî heye: Şerê Birakujiyê. Em dikarin navinen din jî li vê yekê bikin: Şerê navxoyî, şerê xwebixweti-yê, şerê xwekujiyê.

Derba ji der de were ne xedartir e ji ya hundir.

Zîhniyeta xerab a li Başûr tu car bi kêrî doza kurdan nehatiye. Bi giştî ev dikare bê gotin. Lewma jî pêwistî bi tesfiyekirina wê zîhniyetê heye. Vê zîhniyetê em pir lepikandin, em şepikandin û em şihitandin.

Ji aliyê din ve Tirkiye amadehiyên xwe yên ji bo dagirkirina başûrê welêt dike. Niha gelek hezên xwe yên leşkerî raweşandine ser sînor.

Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bi daxuyaniyekê eşkere kir ku Tirkiye biryara dagirkirina başûrê Kurdistanê girtiye.

Wisa xuya dibe ku rojên li pêşiya me wê pir germ bin.

* * *

Qanûna Bajaran ji aliyê Demirel ve hat pesendkirin. Bi vê qanûnê rayeyên walî û polîsan zêdetir bûn.

Ji îro pê ve her waliyek dibe super walî. Polîs jî dikarin ji berê bêhtir mirovan bikujin. Berî ku qanûn bikeve warê pratîkê jî, polîsan ev rayeyên xwe bi kar anîn.

Qaşo dewlet dixwaze hino hino sînorê "Rêveberiya Taybet" teng bike û piştre wê ji navê hilîne. Na ev ne rast e. Tenê nav diguherîne û rayeyên karbidestên xwe, polîs û leşkeran zêde dike. Êdî her der "Rêveberiya Taybet" e, bi gotina tirkî "Olağanüstü hal" e.

Ev rewş, ji bo dewletê, di rastiyê de têkçûn e. Bi gotina rayedarên dewletê êdî "terorîzm" li her derê Tirkiyeyê heye.

Qonaxeke dîroka me

Bûyerên mezin bi domkirina xwe dibin xwedî tesîr. Meziniya tevgera nûjen jî di vê yekê de veşartî ye. Wan di destpêkê de çi rastiyên ku di levzan de anîn zimên, bi biryarên gelek mezin di pratîkê de jî pêk anîn.

MAHMUT DUMLAYICI

Dîroka gelê me bi aliyekî xwe ji berxwedanê û bi aliyê din jî, ji xiyanetê pêk tê. Van her du taybetiyan tesîr li ser giyana me û li kesîtiya me jî kirine. Bûyerên ku li ser berxwedanê bilind bûne dîroka gelê me xistine rêça pêşveçûnê.

Hêjayî gotinê ye ku gelê me heya niha tu carî li hemberî mêtingerî û koletiyê bi temamî serê xwe netewandiye û her dem li ber xwe daye. Lê mixabin ji ber serokatiya li paş demê, bêtifaqî û xiyanetê ev berxwedan neçûne serî û gelê me her car hatiye şikestin, mînaka dawîn Dêrsim e.

Dêrsim ji ber gelek sedeman neçû serî û berxwedan bû qirkirineke hovane, hate perçiqandin. Rewş welatê me û gelê me ya berî hilgavtina 15'yê gelawêjê, heke bi kurtebirî bête vegotin, mîna tarîka şevên bêhêyv bû.

Sedemên têkçûna hemû serhildan û raperînên beriya destpêka xebata şoreşgeriya hemdem mirov dikare di nebûna serokatî, partî û bernameyeke bi rêk û pêk de bibîne. Îro pêşveçûn serfiraziya ku gelê kurd dide jiyandin jî di peydabûna van çekan de veşartî ye.

Hilgavtina 15'ê gelawêjê jî bûyereke wisan dîrokî ye û her ku diçe hîkariya xwe zêdetir dide xuyakirin. Helbet mirov hilgavtineke ew qas girîng û dîrokî nikare tenê bi êrîşên li ser Dihê û Şemzînan çeper bike.

Nêrîneke wiha naveroka 15'ê Gelawêjê teng dike û dibe sedema kêmtêgihîştina wateya wê ya kûr. Beriya her tiştî 15'ê gelawêjê di çi dem û rewşê de pêk hatiye, li ser kîjan bingehê bilind bûye, bi çi zorî û zehmetiyan hatiye amadekirin, divê mirov baş bizane û van pirsan bêbersiv nehêle.

Rewşa Kurdistana di bin desthilatdariya cuntaya faşîst de ji aliyekî ve dûrî mirovayetiyê bû; zilm û zordariyeke mezin li ser gel, endam û alîgirên partiyê dihate meşandin. Çarmedorên welêt ji nû ve hatibûn dagirkirin, ewrên tirsê girtibûn ser hemû qad û qonaxên jiyanê.

Gelek hêz û rêxistinên ku hebûn çi çepgirên tirk û çi rêxistinên kurdistanî hatibûn perçiqandin, bi armanca xelaskirina canê xwe û têrkirina zikê xwe, berê xwe dabûn welatên Ewrûpayê. Baş tête zanîn: demên dijwar bersivên hê dijwartir dixwazin. Heke bersiv ne dijwar, xurt û bi zanistî bin, nikarin pirsgirêkên dîrokî çareser bikin.

Di bin desthilatdariya cuntaya faşîst de Girtîgeha Amedê bû yek ji kelayên berxwedanê. Li hemberî hovîtiya ku dijmin li ser dîlên şer dida meşandin, ne bi berxwedana Mazlum, Çar Lawên Agirî, û meşa 14'ê tîrmehê bûya, ew bûyerên dîrokî û qehremaniya mezin nehata nîşandayin, armanca dijmin ku dixwest xiyanetê di girtîgehan de bi cih bike, wê pêk bihata. Yên ku ew arman cên dijmini bê encam hiştin ew be xwe danvanên birûmet bûn.

Bûyer û destpêkên mezin bi domkirina xwe dibin xwedî tesîr û hîkarî. Meziniya tevgera nûjen û dîrokîbûna hilgavtinên wê jî di vê yekê de veşartî ne.

Wan di destpêkê de çi rastiyên ku di levzan de anîn zimên bi biryarên gelek mezin di pratîkê de jî pêk anîn. Hilgavtina 15'ê Gelawêjê jî, di pêşketina şerçekdarî de qonaxeke mezin e.

15'ê Gelawêjê bersiva mêtingeriyê bi hezaran salan, bersiva zilm û zordariya li ser gel û nîşana girêdayîbûna bi şehîdan ve ye. Ew di kelekela germê, serma û seqema zivistanê de roj bi roj û gav bi gav hate amadekirin. Ev hilgavtin di dilopên xwîna şehîdan de hate sitrandin û bû bilintir qonaxeke di dîroka gelê me de.

Belê, di 15'ê Gelawêjê de çirûskên sê darikên niftika Mazlûm, di çiya û baniyên Kurdistanê de bûn pêtal û riya serxwebûn û azadiyê ronî kirin.

15'ê Gelawêjê ne tenê perçiqandina mejiyê dijmin bû, her wiha kesîtiya kurdê kole jî bi guleya yekemîn hate kuştin, û reva ji şerê çekdarî hate riswakirin. Bi belavkirina pergala komara tirk, tirsa di dilê gel de hate şikênandin



LI Amerîkayê civînek ji bo kêşeya kurdî li Tirkiyeyê li dar dikeve. Li gorî agahiyan roja 17'ê rezberê wê li Washingtonê, Ofîsa Komîsyona Helsinki bi beşdariya Lord Eric Avebury civînek li dar bikeve. Serokê Komîsyona Ewlehî û Hevkariyê ya Ewrûpayê Christopher H. Smith roja 4'ê rezberê vexwendnameyek ji gelek siyasetmedarên amerîkî re şand.

Di vê vexwendnameyê de pişti agahiyên li ser şerê li bakurê Kurdistanê, tê gotin ku Serokê Koma Mafên Mirovan a Parlamentoya Îngilistanê Lord Eric Avebury wê beşdarî civînê bibe û li ser mijarê agahiyan bide.



ROJA 4'ê rezberê li HADEP'a Edeneyê bi beşdariya 100 kesî ji bo bîranîna Mehmet Sincar civînek li dar ket. Civîn bi daxuyaniya çapemeniyê dest pê kir. Piştî daxuyaniyê Mebûsê DEP'ê Sedat Yurttaş derket hemberî mêvanan. Yurttaş wiha got ku, ewê her dem ji bo layiqî wî û doza wî bibiı, wê bixebitin.

Civîna bîranînê bi stran û helbestên koma muzikê ya NÇM'ya Edeneyê qediya. Di eynî rojê de hinek rayedarên HADEP'ê tevî girseya gel çûn ser gora Sincar a li Qoserê. Li wir piştî ku mewlûdek hate xwendin, li ser jiyan û doza Mehmet Sincar axaftin hatin kirin.

NÛÇE

Aştî û şer

Mebûsê RP'ê Fetullah Erbaş gav bi paş de neavêt û got ku heke pêwist be ewê careke din jî here. Divê bê gotin ku rayedarên Partiya Refahê jî Erbaş bi tenê nehiştin û dan zanîn ku Erbaş bi biryara xwe, lê bi mebesta pêkanîna doza însanî çûye, lewre ewê rê nedin ku, mûafiyeta Erbaş bê rakirin.

Hefteya çûyî hem ji aliyê çalakiyên aştiyê ve, hem jî ji aliyê çalakiyên şer ve bijûn bû. Wekî tê zanîn 1'ê rezberê ji aliyê aştîxwazên cîhanê ve ji bo bilindkirina doza aştiyê û lanetkirina şer bi çalakiyên cur bi cur tê nirxandin.

Îsal jî 1'ê rezberê bi çalakiyeke girseyî dest pê kir. Bi sazûmankariya HADEP, ÖDP, DBP, KESK, Sine–Senê li Zîndanên Yedikuleyê şahiyeke mezin li dar ket. Bi qasî 15 hezar kesî beşdarî vê şahiyê bûn. Wan bi sloganên wekî: "Aştî a niha!", "Bijî biratiya gelan!" doza aştiyê kirin. Di şahiyê de gelek hunermendên wekî Edip Akbayram, Koma Çiya, Metin Kahraman, Ferhat Tunç, Koma Dengê Azadî, Nilüfer Akbal, Yavuz Bingöl, Mazlum Çimen, Ezginin Günlüğü, Bulutsuzluk Özlemi, Zuğaşi Berepe, Muammer Ketencioğlu bi stranên xwe yên ji zimanên cur bi cur dilê aştîxwazan geş kirin.

Divê bê gotin ku jinên aştîxwaz tev bi hev re bi trenê hatin cihê şahiyê, yanê tren kirin ekspresa aştiyê. Ji îstasyonê jî heta cihê şahiyê bi sloganên "Em jin, şer naxwazin", "Aştî a niha" meşiyan. Her wiha kesên mîna Cîgirê Serokê HADEP'ê Güven Özata, Serokê DBP'ê Refik Karakoç, Serokê ÖDP'ê Ufuk Uras, Mihri Belli, Ercan Kanar jî bi axaftinên xwe beşdarî şahiyê bûn. Şahiyê ji 12'yê nîvro heta 12'yê nîvê şevê dewam kir. Di şahiyê de dîsa boşahiya kurdan ber bi çav bû. Digel vê çalakiyê, aştîxwazan li gelek bajarên din ên Kurdistan û Tirkiyeyê jî bi çalakiyên cihêreng doza aştiyê kirin. Li hinek bajarên Kurdistanê hêzên dewletê rê nedan çalakiyên aştyê.

Li aliyê din şerxwaz jî vala nesekinîn, bi taybetî jî bi ser heyeta ku ji bo leşkerên dîl çûbû başûrê Kurdistanê ve, çûn. Piştî ku dîmenên li Bargeha Zapê ya ARGK'ê di televîzyonên tirkan de hatin dîtin, di serî de Demirel, Türkeş, Ecevit, Yılmaz û Serokê Meclîsê Kalemli û gelek siyasetvanên tirkan, cezakirina endamên heyetê xwestin. Bi taybetî berdevkên şer rakirina mûafiyeta Mebûsê RP'ê Fetullah Erbaş xwestin û ferman dan dozgerên DGM'ê ku endamên heyetê ceza bikin.

Akın Birdal û İsmail Aslan hatin girtin

Li ser vê yekê Dozgerê DGM'ya Enqereyê Nuh Mete Yüksel, daxwaza wan anî cih û şeva 2'ê rezberê biryara girtina kesên mîna Serokê İHD'ê Akın Birdal û Cîgirê Serokê Mazlum–Derê İsmail Arslan da. Akın Birdal wê şevê girtin bınçav, İsmail Arslan jî roja din bi xwe çû teslîm bû. Aştîxwazan ev yek bi çalakiyên xwe protesto kirin.





Di şahiya aştiyê de diya leşkerekî û ya gerîlayekî bi hev re agirê aştiyê pêxistin.

Roja 3'yê rezberê bi beşdariya gelek rewşenbîran li İHD'ya Stenbolê civînek ji bo çapemeniyê li dar ket. Di vê civînê de kesên mîna Ercan Kanar, Şanar Yurdatapan, Ferhat Tunç û ji Mazlum–Derê Burhan Kavuncu dîtinên xwe anîn zimên. Kesên ku beşdar bûbûn dan zanîn ku dewletê xwestiye bi girtina van kesan çavên aştîxwazan bitirsîne, bi vî awayî jî rê li ber çalakiyên bi vî rengî bigire.

Lê wan diyar kir ku ewê her li ser doza xwe berdewam bin. Şanar Yurdatapan got: "Heke aliyê din biryara berdana leşkeran bide emê ji bo anîna leşkeran dîsa biçin." Roja 4'ê rezberê jî gelek rewşenbîran daxwazname ji rayedarên dewletê re şandin û berdana Akın Birdal û İsmail Arslan xwestin. Her wiha gelek rewşenbîr û akademîsyenan bi daxuyaniyekê piştgiriya xwe ji bo aştiyê nîşan dan.

Li aliyê din Mebûsê RP'ê Fetullah Erbaş li hemberî êrîşên berdevkên şer gav bi paş de neavêt û got ku heke pêwist be ewê careke din jî here. Divê bê gotin ku rayedarên Partiya Refahê jî Erbaş bi tenê nehiştin û dan zanîn ku Erbaş bi biryara xwe, lê bi mebesta pêkanîna doza însanî çûye, lewre ewê rê nedin ku, mûafiyeta Erbaş bê rakirin.

Saddam Hewlêr dagir kir

Hefteya çûyî çalakiyeke şerxwazan jî bi dagirkirina Hewlêrê ji aliyê hêzên Saddam û PDK'ê ve, dest pê kir. Roja 31'ê gelawêjê hêzên PDK bi alîkariya hêzên Iraqê ketin Hewlêrê. Piştî ku ew der ji bin kontrola YNK'ê derxistin, gelek kes kuştin û gelek jî dîl girtin. PDK'ê piştî bûyerê îdia kir ku ji bo ku ew xwe li hemberî êrîşên YNK û Îranê biparêze ji Saddam alîkarî xwestiye. Lê ev gotin ji aliyê derdorên kurd ve wekî hinceteke nelicih hate nirxandin û kirina PDK'ê wekî xiyanetê tê binavkirin.

Serokê PKK'ê Abdullah Öcalan ji hêzên kurd xwest ku xwe nespêrin dijmin û ji PDK'ê jî xwest ku zirarê nede kesên dîl û gelê Hewlêrê. Li ser kirinên hêzên Saddam rojên 3 û 4'ê rezberê Amerîkayê bi dehan moşek arasteyî Iraqê kirin. Li gorî agahiyan piştî van êrîşan heta niha 6 kes mirine, hejmara birîndaran jî ji 20'î zêdetir e. Dewleta tirk jî dixwaze aloziya li Başûr ji xwe re bike hincet û êrîşeke nû bibe ser Başûr.

Ji çalakiyên vê hefteyê jî xuya dibe ku berebaziya şer û aştiyê wê hê gurtir bidome.

SAMÎ BERBANG

Çeşnên hunerê û di têkoşînan de rola wan

Çi gava ku ew şervanên azadiyê xwe ji nav keftûlefta şer gihandin nav jiyana rojane (heye ku di nav şer de jî), wê wan romanên ku wêjeya kurd jê re tî ye, binivîsînin. Çi gava ku zarokên kampa Etruşê perwerdehiya xwe ya bi kurdî kuta kirin, wê hunemend û nivîskarên têgihîştî, çandyar ji wan derkevin û çend ji wan wê çîrok û romana şoreşê binivîsînin.


Cegerxwîn

Huner, bi kurtasî şêweyeke derkirina hest û ramanên mirovan e; ew rengvedana jiyanê ye. Hest û raman bi navbertiya heyînan û bi bandora wan, li gorî awayê jiyanê dirûv distînin, çêdibin. Bêyî heyînê raman, bêyî ramanan hest û pejn, bêyî zimên jî raman çênabe. Ev her çar bûyer bi awayekî organîk û pihêt bi hev ve girêdayî ne. Jiyan bi xwe jî, ji van her çar hêmanan tê pê û tevdigere. Huner jî, liv û bizaveke jiyanê ye, parçeyek jê ye. Ev parçe, yanê huner bi hevgihandina hest û ramanê pêk tê; huner tevî van yekan awayek ji dirûvgirtina jiyanê ye.

Albert Camus, hunerê bi vî rengî salox dide:

"Huner ew e ku dîtin û afirandina dirûv û dîmenên ku bi hejmara herî pir, mirov bi êş û jan û dilgeşî û şadbûniyên hevpar, bi coş dike."

Mirov bi navbertiya hunerê, bi hest û ramanên xwe nêzî hev dibin û wan bi hevbeşî (her çend ne wekî hev bin jî, dişibin hev) dihisin, diramin û dijîn. Huner bi xwe rastiyek e, jiyan bi xwe ye; tê de bêhêvîtî, êş, kêfxweşî û dilşadî, hêvî û mirina erjeng... heye. Li wî cih û warê ku lê huner heye, hêvî û jiyan jî heye; huner mişt bi hêviyê dagirtî ye.

Huner bi cureyî, di nava xwe de dibe heft beş; Peykertraşî, opera, şano, wêne, muzîk, wêje û sînema. Her wiha ji van tevan re "Hunerên bedew" jî tê gotin. Her yek ji wan di nava xwe de çeşn û teşeyên cihê cihê dihewînin.

Hunermend, ew kes e ku hest û ramanan bi awayê jiyana xwe bi hev digihîne, wan di pêlanoka jiyanê re derbas dike, li ser wan ramanên xweşbîn û ronak diafirîne û dibe xwedî nîgaşeke (imge, imagination) xwerû û berfireh. Gerdûna wî/wê ya bi hest û raman û nîgaşan dagirtî, ji têkiliyên civakî yên her cureyî wekî evîn, neyartî, gir (kîn), xweşdîtin û hwd. re vekirî ye. Em dîsa guh bidin Albert Camus:

"Gerdûna hunermend, gerdûneke pevçûn û lihevhatinê ye. Ew ji ber hunermendiya xwe bêgav e ku, ji dijminên xwe jî tê bigihîje û ev yek divêtiyek e jî!"

Hunermend bi van taybetiyên xwe rewşenbîrek e (her rewşenbîr ne hunermend e, lê belê her hunermenda/ê rastîn rewşenbîr e).

Hunermend divê, bêyî ku bi awayekî mekanîk û nelihev, dîtin, hest û ramanên kesên din bistîne û wan di berhema xwe de bi kar bîne, divê bi dîtina xwe ya berfireh, xwerû û cihêreng a ji rûdanên jiyanê pêkhatî, berhema xwe biafirîne. Belê huner her çend parçeyek ji jiyanê be jî, ew gelek caran û birêgezî (prensîbî) rê li ber jiyanê vedike; wê bi hêviyê dadigre, rengê wê eşkere dike, çêj û eles didê...

Rola hunerê di têkoşînê de

Dostoyevsky wiha dibêje:

"Her mirov, li hemberî her kesî, ji her tiştî berpirs e."

Huner çendî rê li ber jiyanê veke, wî çendî jî divê pêşevaniyê ji jiyan û têkoşînê re bike. Ew her û her gavek du gav li pêş têkoşînê ye; bergehê wê diyar dike. Heke em bala xwe bidinê, li dîrokê di gelek têkoşînan de hunerê pêşevanî ji şoreşan re kiriye.

Ku em vegerin ser şoreşa xwe, em dê nikaribin ji vê yekê re bibêjin erê, wisa ye! Cihê gotinê ye ku mirov ji cureyên hunera kurdan wekî sînema, peykertraşî, şano û wêne re bibêje, ew ji ber bêderfetiyê nikarin rola xwe bilîzin. Di van çend salên bihurî de hin xebatên wêne û şanoyê tên kirin, lê ew hê ji bo pêşevaniyê ne tekûz in; di dema xwe ya çarlepkê de ne.

Muzîka kurdî

Di hunera kurdan de ya herî pêşketî muzîk e. Muzîka kurdî di têkoşînê de rola xwe ya pêşevaniyê heya tu bibêjî lîstiye û dilîze jî. Ger em bipirsin û bibêjin, "Gelo çima muzîk ev çend cihekî girîng û fireh di şoreşa kurdan de digire û ya herî pêşketî ye?", em dikarin wiha bibersivînin:

"Muzîk ew huner e ku ji hunerên din hêsantir e û rasterast digihîje mirovan; bi kaset, radyo, televîzyon, şahî û dîlanan. Jixwe em kurd evîndarên muzîkê ne. Ji hezar salan vir de ye me bi navbertiya muzîka xwe hebûn, çand, ziman, dab û nêrîtên xwe parastine û veguhezandine roja îroyîn.

Em kurd hê di dergûşê de muzîkê nas dikin; dayika me, me bi stran, lavij, dîlok û zêmaran dilorînin. Dil û ruhê me mişt bi muzîkê tijî dibe. Di vê dema dawîn de êdî wisa bûye ku dema dora axaftinê tê ser hunerê, gelek mirovên kurd ji bilî muzîkê tu cureyê hunerê bi bîr naynin.

Hunermend û muzîkvanên me wekî T. Taha, M. Şêxo, Ş. Perwer, A. Tîgran, Sefkan, Mizgîn û yên din bi deng û awaz û stranên xwe, hiş û bîra gelê kurd vekirine, derman kirine, hişyar kirine; dem bi dem pêşevanî ji şoreş û têkoşînê re kirine, rê li ber jiyanê vekirine, ew bi hêviyê dagirtine.

Li gorî asta têkoşînê hê ne têrî pêdiviyê be jî, divê xebatên hêja yên NÇM'ê jî, ku li ser muzîka nûjen a kurdî tên kirin, neyên paşçavkirin.

Wêjeya kurdî

Ji her cure berhemên nivîskî re wêje tê gotin. Ew ji çîrok, helbest, bîranîn, gotar, ceribandin û romanê pêk tên. Wêje, tevgerîneke ramanê ye. Di berhema nivîskî de nêrîna nivîskar di nav peyvê re derbas dibe û ber bi waneka (bireser) ku tê vegotin ve diçe. Di berhema nivîskî de peyv, bes navgîna hest û ramanê ye. J.P. Sartre, nivîskar wiha bi lêv dike:

"Nivîskar ew kes e ku bixwaze, nexwaze, navê wekî evîn, dijminatî li têkiliyên di nav mirovan de yên diyar û nediyar dike; her wiha jî li têkiliyên civakî jî navên wekî stem, piştevanî datîne. Nivîskar dibe ku di berhema xwe de nexwaze wê waneka ku vedibêje, rasterast bîne ziman; li vê derê ew afirînerîya xwe datîne rastê û wê wanekê li gorî xeyala xwe vediguherîne li waneka dîtir."

Wêje di nav xwe de bi naverokî li çar beşan parî dibe: Nûjengirî, rastîgiriya nû, rastîgiriya rexneyî, rastîgiriya civakî. Di pêvajoya şoreşan de gelek nivîskaran berhemên xwe bi çeşnê "rastîgiriya civakî" afirandine. Berpirsiya xwe anîne cih.

Wêjeya kurdî, li gorî hunerên din (ji bilî muzîkê) hinekî dilive, dixwaze bi pêş bikeve. Wekî em dizanin taybetiyeke xweş a zimanê kurdî heye, ev e:

Zimanê kurdî, jixwe bi hevdeng (kafiye) û melodîk e. Ev taybetî ya hevdengî, helbesta kurdî, di çeşnê malik û çarînê de bi pêş ve biriye û şaîrên wekî

Nalî, Goran, Hejar û yên din helbestên xwe bi vî rengî nivîsandine.

Her çend şaîrê hêja Cegerxwîn helbestên xwe li ser vî hîmî nivîsandibe jî, hinek be jî ji helbestên wî yên dawîn, bêhna helbesta serbest tê.

Dema mirov dêhna xwe dide ser naveroka helbestên Cegerxwîn, mirov dibîne ku ew mirovî ne, civakî ne; bi evîn, têkoşîn, welathezî, mirovhezî, evîna xwezayê, hêvî, aramî... tijî ye. Ev şaîrê hêja û nemir, zêdetir salên jiya (temen) xwe, di nav gelê xwe de buhurandine. Wî xeyalên xwe ji jiyana gelê xwe, ji têkoşînê, ji xwezayê, ji evînê pêk anîne. Wî berhemên xwe ji aliyê mijar û naverokê ve bi çeşna "rastîgiriya civakî" nivîsandine.

Şaîrên nûjen wekî Şêrko Bêkes, Rojen Barnas... jî bi xeyaleke berfireh û stewandî (têgihiştî) helbesta kurdî bi pêş ve birin û xistin nav helbesta nûjen ên dinê.

Sed heyf û mixabin ku em nikarin van gotinên xwe yên erênî di warê berhemên pexşanî de (wekî; çîrok, roman) bibêjin. Wêjeya kurdî ji aliyê nivîsîna çîrok û romanê ve gelekî lawaz e. Jixwe van salên dawiyê li ser vê yekê gelek nîqaş û gotûbêj tên kirin. Tiştê ku herî pir tê gotin ev e:

"Gelo çima rewşenbîr û nivîskarên me çîrok û romana şoreşê nanivisînin."

Belê em nikarin bibêjin çîrok û romana bi kurdî nehatiye nivîsandin; Ew ji aliyê M. Uzun, E. Şemo, F. Cewerî û nivîskar û rewşenbîrên din ve hatine nivîsîn û tên nivîsîn. Lê belê ew ne yên şoreşê ne û ev yek nayê wê wateyê ku ew ne hunermend û nivîskar in.

J. P. Sartre berpirsiyên nivîskarekî/ê bi vî awayî dadixuyîne:

Divê nivîskar

– Avaniya (kurgu) erênî ya azadî û rizgariyê çêbike



– Têkiliya di navbera rê û mebestan de, diyar bike

– Stemkariyê ji aliyê çîn û kesên stembar ve xerab bike

– Bi navê xwe, li dijî stemkariyên her cureyî derkeve, li hember raweste

– Her tim, bêrawestan li ser rê û mebestan, li ser têkiliya sinc (etik) û polîtîkayê bifikire

Romanivîs E. Hemingway tevlî şoreşa (şerê navxweyî) İspanyayê bûye, ew jiyaye û piştre romana xwe ya binavûdeng "Zengil ji bo kê lê didin" nivîsiye. Dostoyevsky, M. Gorkyî, B. Brecht, P. Neruda ku ew bi hunermendiya xwe li dinê bi navûdeng in, berhemên xwe di nav tekoşînê de afirandine.

Wan berhemên xwe bi çeşnê "rastîgiriya civakî" nivîsandine. Divê romana şoreşa kurdan jî bi vî rengî bên nivîsîn. Ku bê pirsîn çima divê? Em dikarin vê bersivê bidin:

Lewre xeyala tu heyîn û bûyer bêyî dîtin çênabe. Ger ew xeyal çêbûbe ji, ew bes xeyal e û bi tenê di nava xwe de rastiyekê dihewîne. Lewre bêyî xeyalê avanî pêk nayê, bûyer nayê honandin. Divê jiyan bê vegotin; tê de mezinkirin (mubalexe) jî hebe, mezinkirin jiyan bi xwe ye! Lewre divê toqîn û erjengiya şer û mirin... evîn û hêvî, sirgûn û koçberî, gemarî û sotîneriya şer, lehengî û xinizî, aşîtîxwazî û şerxwaziyê... bên vegotin.

Belê ez bawer im û bêguman, hunermend û rewşenbîrên me ji aliyê zanîn û xeyalan ve xwedî van taybetiyan in. Lê çi kêm e? Bersiv ev e: Jiyîna têkoşîn û şoreşê...

Li ser van yekan ez hêvîdar im û dibêjim, dibe ku di pêvajoya îroyîn de romana şoreşa kurdan neyê nivîsîn (hêviya min nivîsandina wê ye), lê dîsa jî ne xem e. Çi gava ku ew şervanên azadiyê xwe ji nav keftûlefta şer gihandin nav jiyana rojane (heye ku di nav şer de jî) wê wan romanên ku wêjeya kurd jê re tî ye, binivîsînin. Ew kesê ku ji bo pêkanîna xeyala xwe canê xwe dide, xeyala wî/wê, wê bi qasî nivîsîna romanê jî fireh be.

Çi gava ku zarokên kampa Etrûşê perwerdehiya xwe ya bi kurdî kuta kirin, wê hunermend û nivîskarên têgihîştî, çandyar ji wan derkevin û çend ji wan wê çîrok û romana şoreşê binivîsînin. Çi gava ku zarokên cangoriyan ên toqîn û erjengiya şer dîtî, jiyayî, mezin bûn, dê berhemên hêja û spehî biafirînin.

Ew mirovê ku bi canê xwe destanan dinivîse, nivîsandina romanekê bi pênûsê, jê re ne tiştek e...

DILAWER

Mirov bi mafên xwe dibin mirov

CELALETTİN YÖYLER



Di îteratura zanyarî ya jîndaran de mafên mirovan, gelan, neteweyan, rawir, teba û tarîşan bi hev re tên ditîn. Ango her tiştê ku candar e di jiyanê de xwediyê mafan e. Lewre maf bi nirxandina olî û zanyarî hevalê her jindarî ne. Dema ku candar hatin afirandin ji aliye heyîna mezin ve mafên wan jî bi wan re heval û hogir in. Tu heyîn bêmaf nayê ponijandin, ji ber ku hebûna her jîndarekî bê hevaltiya mafan, li dijî zagonên zanyarî û olî ye. Hem jî jîna bêmaf bi awaye wan zagonan bêwate ye.

Belê bi rastî û zanyarî her heyînek dema ku hatiyê afirandin, ji wî re bi hezaran mafên cur bi cur hatiye naskirin. Wan heyînan jî bi awayê olê û zanyarî di xebitandina wan mafan de divê serbest û azad bin.

Lê ew heyîna ku hemû heyînên di cîhanê de û di ezmanan de her ji bo wî hatine afirandin ku ew, ji mirovahiyê tê, cihê wî di xebitandina mafan de pir girîng e. Divê ku ew heyîna mirovahiyê çiqas mafên wî yên mirovahî hene, bêçeper û asteng bixebitîne. Lewre ew maf parçeyekî ji wê heyîna mirovahiyê ne û pê re hatine afirandin û jê naqetin.

Pir mixabin mafên ku Xwedê bi mirovan re afirandine û dane wan, têne perçiqandin. Hem jî ji aliyê birayên wan ên mirov ve. Ev jî bêdadiya herî mezin e ku ji aliyên xwişk û birayên mirovan ve li mirovan tê kirin. Ew kesên ku mafên mirovên wekî xwe diperçiqînin, ew ji rendêriya mirovahiyê bi dûr dikevin û dibin wekî tebayên har û dirende, êrîşî ser mafên mirovan dikin û diperçiqînin. Ew kesên ku êrîşî ser mafên kesan û gelan dikin, ew bi rastî êrîşî ser mafên mirovan bi tenê nakin, ew êrîşî ser Xwedê û Pêxember û Qurana Xweda jî dikin. Lewre dema ku Xweda, mirov çêkiriye hemû wekî hev çêkirine. Di çêkirin û afirandina wan de ji bilî wekhevbûnê tu cudatî tune ye. Ango hinekan bi rûmet bilind, hinekan jî kole û kêmrûmet çênekiriye. Hem jî negotiye:

"Bila ereb û tirk û faris" û hinek nijadên din, ji çîna yekemîn bin û her mafên mirovahiyê di pêlekana yekemîn de para wan be û ew ji xwe re bixebitînin. Ew gelên din jî wekî kurd, reşik û hinekên din, ew jî kole û bendî bin, nebin xwediyê tu mafên mirovî. Na! Sed û bist caran na! Xweda tu kesekî serok û rûmet bilind, yekê dinê jî benî û kole neafirandiye.

Hem jî li ba Xweda yek in, wekhev in di xebitandina mafên taybetî û siyasî û mirovahî de.Gelê kurd jî di xebitandina mafên taybetî û siyasî de wekî gelê tirk û ereb û faris e. Zarokên tirkan çawa bi zimanê dayikên xwe di dibistanan de bi serbestî û serfirazî dixwînin, divê ku zarokên kurdan jî di dibistanên xwe de bi serbestî û serbilindî bi zimanên dayikên xwe bixwînin. Hem jî hemû mafên xwe yên Xwedayî û mirovahî û çandî û neteweyî bixebitînin. Lewre ew jî wekî birayên xwe yên tirk, ereb û faris mirov in û bêcudatî xwediyê hemû mafan in.

Lê pir mixabin hinekî ji kesên xwediyên bîr û baweriyên nîjadperestî û fermî, li pêş mafên gelê kurd û biratiya zarokên her du gelan, bûne çeper û asteng. Ew nahêlin her du gel bi serfirazî û serbilindî mafên xwe yên mirovahî bi wekhevîtî bixebitînin û bi hev re bijîn.

Lê bila ew nîjadperest baş bizanin, maf tu demê nayê dayîn, tê standin. Wê rojekê gelên me yên li ser rûyê vê qada komara hanê bibine xwediyê mafan û bi hev re bijîn.

Silav li parêzvanên mafên mirovan, silav li wan kesên ku di cîhanê de wekî gelê kurd têkoşîna mafên xwe yên taybetî, mirovahî dikin, silav li çîna karker û rewşenbîrên gelê kurd û yên tirkên xwenas, silav li biratiya gelan be, ya li ser bingeha wekheviya mirovahî.

‘Bila alfabeyeke neteweyî bê amadekirin’



Dr. Arslan diyar kir ku nivîsandina tîpên cêwî îro ji kurdan re ne astengae yekemîn e. Gava ku zimanê kurdî di qada aborî, rêzanî, çandî û zanistî de bê bikaranîn ev astenga biçûk wê ji holê rabe. Astenga me ew e ku îro zimanê kurdî bi dorfirehî di hêla nivîsandinê de li nav gel belav nebûye.

Roja 25’ê gelawêjê ji aliyê Navenda Çanda Mezopotamyayê Şaxa îzmîrê ve li ser alfabeya kurdî panelek çêbû. Axivgerên panelê li ser dîroka alfabeyan bi giştî û bi taybetî jî li ser dîroka alfabeya kurdî sekinîn. Axivgeran daxuyandin ku, yekîtiya neteweyî bi yekîtiya ziman, yekîtiya ziman bi yekîtiya alfabeyê çêdibe. Giraniya axaftina axivgeran çû ser alfabeya ku îro bi gelemperî tê bikaranîn, ango alfabeya Celadet Bedirxan.

Panel ji aliyê Kluba Wêjevanan ve hat amadekirin û li ser navê wêjevanên NÇM’a Îzmîrê Nesim Sönmez panelê pêşkêş kir.

Axivgerên panelê ev kes bûn. Nivîskar Kaya Müştakhan, Nivîskar Ahmet Aras, Mele İsmet Kılıçarslan û Dr. Ali Rıza Arslan.

Di panelê de beşdaran bi du doran mafê axaftinê girtin û paşê pirsên guhdaran bersivandin. Di dora yekemîn de berê mafê axaftinê Nivîskar Kaya Müştakhan girt û bi gelemperî li ser alfabeyên ku ji aliyê kurdan ve tên xebitandin rawestiya. Müştakhan bi gotineke Celadet Bedirxan dest bi axaftina xwe kir:

“Yekîtiya însan bi yekîtiya ziman, yekîtiya ziman jî bi yekîtiya tîpan çêdibe.”

Müştakhan dûv re li ser averûya alfabeyê rawestiya û gotinên xwe wiha qedandin:

“Kurdan heta sedsala 17’yan berhemên xwe bi erebî û bi farisî dane. Bi sedsala 19’an hewcetiya alfabeyeke latînî derketiye holê. Ez bawer im ku bi biryareke fermî di dema Stalîn de rewşenbîrên kurd ên li nav ûris êdî alfabeya kirîlê xebitandine.

Di warê alfabeya Celadet Bedirxan de jî dikarim vê bibejim. Ji bo nivîsandina tîpên cêwî (wekî r,k,ç,p) di nava wî û Osman Sebrî de niqaşî derketiye.”

Mele İsmet Kılıçarslan jî li ser helwesta dewletê ya li hemberî zimanê kurdî sekinî û wiha dewam kir:

“Ziman jî wekî zeviyê bi bereket e. Bes, divê bê hilanîn û danîn, divê îmaret lê bê kirin. Xebata ku di warê ziman de pêk tê, bi saya alfabeyan e. Alfabe dewlemend be ziman jî dewlemend e. Ji ber vê yekê zimanê kurdî ji holê nehatiye rakirin.”

Mele İsmet beşdarî biryara pejirandina alfabeya Celadet bû û pêşniyareke wisa kir:

“Alfabeya Celadet Beg ji yên din hêsantir e û di nava gel de belav bûye. Ew ji aliyê hemû kesan ve êdî tê nasîn. Bila bi zaravayê kurmancî ev alfabe bê xebitandin û bi zaravayê soranî jî bila alfabeya erebî bê xebitandin.”

Ahmet Aras jî li ser pirsgirêkên di warê alfabeyan de sekînî. Piçekî li ser malbatên zimanan rawestiya û cihê zimanê kurdî nîşan da. Aras daxuyand ku cara yekemîn hin gelan alfabeya xwe afirandine. Gelên ku di vî warî de bi şûn de mane, paşê alfabeya xwe afirandine. Ji ber vê yekê wan ji yên pêşîn alfabe û tîp deyn kirine û li gorî zimanên xwe guherandine.

Der barê alfabeya Celadet jî wiha got:

“Ew pir li zimanê kurdî hatiye, lê kes nikare bibêje bila hemû kes alfabeyekê hîn bibin. Ev jî ne gengaz e. Mînak niha gelê herêma soran bi alfabeya erebî xebatê dike. Êdî nikare bi asanî dev jê berde û mafê me tune ku em bibêjın, “werin hînî alfabeya latînî bibin”.

Nivîskar Aras paşê ev pêşniyaz anî holê: “Divê saziya zimanê kurdî bê damezirandin û ji bo rastnivîsê rêberek amade bibe. Di vî warî de enstîtu û rewşenbîr werin ba hev, guftûgoyên zanyarî pêk bînin. Pêwist e ku îro her kes li gorî xwe nexwîne û nenivîse.”

Nivîskar Aras wiha dawî li gotinên xwe anî:

“Hinek dibêjin ku bila di alfabeya Celadet de reform çêbibe. Na ez ne alîgir im di vî warî de. Lewre kêmasiyên alfabeyê hene, wekî nebûna ferqa tîpên cêwî di nivîskî de.‘Ker’ û ‘ker’ nivîs yeke lê wate ne yek e. Yek deng nastîne û yek jî sewal e.”

Di panelê de axivgerê dawiyê Dr. Ali Riza Arslan bû. Arslan bi dorfirehî li ser pêvajoya alfabeyê rawestiya û têkiliyên nivîsandin, dîrok û mirovahiyê bi hev danîn rastê. Dr. Arslan got ku dîrokê bi nivîsandinê dest pê kiriye û nivîsandinê jî bi wênenûsê (resim yazısı) dest pê kiriye. Arslan daxuyand ku dayika hemû alfabeyan a kenaniyan e.

Arslan, li ser alfabeyên kuji aliyê kurdan ve tên bikaranîn sekinî û diyar kir ku çar alfabe hatine xebitandin:

1) Alfabeya Medan, 36 tîp
2) Alfabeya Avesta, 44 tîp
3) Alfabeya Masî–Seratî piştî ola îslamê ku ji aliyê kurdan ve hatiye pejirandin, hatiye xebitandin.
4) Alfabeya Êzidiyan; kurdan ew bi xwe afirandiye, ji 31 tîpan pêk tê. Balkêş e îro alfabeya Celadet jî, ji 31 tîpan hatiye pê.

Kurdan ew alfabe afirandine û xebitandine. Lewre Dr. Arslan daxuyand ku alfabeyên ku ji aliyê kurdan ve hatine xebitandin, lê wan neafirandine jî hene. Ev jî ev in:

1) Alfabeya Aramî
2) Alfabeya Erebî
3) Alfabeya Kirîlî.

Wî got: “Daxwaz û pêşniyazên min ew in ku, berî her tiştî alfabeyeke neteweyî bê amadekirin. Li nik min bingeha vê alfabeyê wê latînî be û alfabeya Celadet Bedirxan jî ya herî nêzîkî vê pêşniyaza min e.

Dr. Arslan diyar kir ku nivîsandina tîpên cêwî îro ji me re ne astenga yekemîn e. Gava ku zimanê kurdî di qada aborî, rêzanî, çandî, zanistî de bê bikaranîn ev astenga biçûk wê ji holê rabe. Asteng ew e ku îro zimanê kurdî bi dorfirehî di hêla nivîsandinê de li nav gel belav nebûye. Şermeke mezin e neteweyên din bi alfabeyên xwe bi saya teknolojiyê bûne xwediyê dinyayê, lê kurd di sedsala bîstî de jî, hê li ser alfabeyê û tîpên cêwî disekinin. Dr. Arslan di dawiya axaftina xwe de pêşniyazên xwe wisa rêz kirin:

1) Afirandina alfabeyeke neteweyî pêwist e, ger ev çênebe zaravayên kurdî di pêşerojê de wê ji hev dûr bikevin.

2) Hewce ye hemû zarava bi alfabeyekê bên nivîsandin.

3) Ji bo vê alfabeyê karê karvanî pêwist e.

4) Divê gelê Başûr û Bakur hînî alfabeyên hev bibin û ev jî di demeke kurt de were cih.

5) Hewce ye kurmanc, zaza, soran û goran di warê alfabeyê de civîneke neteweyî pêk bînin û di vî warî de rastnivîsa zimanê kurdî amade bikin. Ev jî girêdayî hêza ramyarî ye.

FEREC KURÊŞIVAN



● **9.9.1984:** Yılmaz Güney çû ser dilovaniya xwe. Güney di sala 1938'an de li Siwêregê hatiye dinyayê. Li Edeneyê mezin bû û bi sînemayê re eleqedar bû. Piştre bi alîkariya Yaşar Kemal li Stenbolê kete nav jiyana sînemayê. Güney ji ber ku fîlmên der barê jiyana kurdî û êşên gel de çêdikirin pir caran hate girtin. Piştre ji Tirkiyeyê çû Fransayê û li wir jî bi hin rewşenbîrên kurd re Enstîtuya Kurdî ya Parîsê ava kir.

● **12.9.1980:** Li Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê derbeyeke faşîst ji aliyê Serkana Gîştî ya Artêşa Tirk ve li dar ket, wê derbeyê de bi sedan welatparêz hatina qetilkirin. Derbeya 12'yê rezberê bi temamî li hemberî welatparêz û gelperweran bû. Ji 40 mirovî zêdetir hatine daleqandin. Berî 12'yê rezberê Süleyman Demirel ku serokwezîr bû. Derbeya 12'ê rezberê di dîroka Tirkiyeyê de rûpeleke reş e ji bo hêzên azadîxwaz û welatparêz.

● **10.9.1984:** Hayri Durmuş di berxwedana birçîbûna mirinê de bû şehîdbû.Bi derbeya 12 rezberê rejîma faşîst a xwînxwar rûyê xwe li her deverê nîşan da. Li girtîgehan qetlîamên mezin pêk hatin, li hemberî wan hovîtiyan welatparêzna dest bi berxwedanên mezin kirin, di encama wan berxwedanan de Hayri Durmuş tevî çar hevalên xwe ket nav refên şehîdan.

● **11.9.1961:** Li başûrê Kurdistanê serhildan li hemberî rêjîma faşîst a Iraqê pêk hat.

●**12-28.9.1924:** Serhildana Nastûriyan li hemberî dewleta tirk pêk hat.

AWIR

Ji Gulên Mezrabotan

Pêşengeha wênayan a aştiyê



Di her nexşekî de di her xêzekê de ramanek, evîneke bêdeng, lê bi mane anîne jiyanê.

Gulên Mezrabotan ji bo roja aştiyê pêşangeha resimên ku bi xwe çêkirine, li Navenda Çanda Mezopotamyayê pêşkêşî dîtina gel kirin. Pêşangeha ku di roja aştiyê de hate vekirin heta 8'ê mehê wê bidome.

Dîtin û ramanên xwe der barê aştiyê de bi resman ve anîne ber çavan. Resmên biratiyê, yên aştiyê, yên cîhaneke paqij a bêşer, bêberjewendî bi rengên kesk, sor û zer ve xemilandine. Digel vê yekê, resmên bindestiyê û yên li derî îradeya xwe jî çêkirine.

Hem bi psîkolojiya zaroktiyê ve hem jî bi psîkolojiya mirovekî ku xwe ji van kirêtiyan berpirs dibîne resmên xwe xemilandine. Di her nexşekî de, di her xêzekê de ramanek, evîneke bêdeng lê bi mane anîne jiyanê. Resmên wan digotin:

"Zaroktî ew qas ne hêsan e, em nikarin bêyî zimanê xwe, bêyî çand û hunera xwe bibine zarok, bibine zarokekî kurd. Mafê me yê jiyaneke azad jî heye, em di cihê gule û barûdê, top û tivingan de gul û sosinan li çiya, li deşt û zozanan biçînin. Bila bêhna wan ji bo biratiyê, ji bo aştiyê li her derê dinyayê belav bibe".

Lê berpirsiya xwe jî bi awayekî bi rengan xêz kiribûn. Di her resmekî de hem berpirsiya xwe nîşan didan hem jî daxwazên xwe.

Aştî daxwaza her gel, her mirovê ku haji mirovatiya xwe heye. Lê îro li 40 deverê dinyayê zêdetir şer heye, li hin cihan ji bo azadî û serxwebûnê şer didome, li hin deveran jî, ji bo berjewendiyan qetlîam û hovîtî didome.

Bandora şer herî zêde li ser zarokan û jinan çêdibe. Zarokên ku şer dibînin piştre nikarin ciwaniya xwe bêproblem bijîn. Dibe ku hin zarok li metropolan bijîn, haya wan ji van bûyeran tune be û berpirsiya xwe ji bo birayên xwe neynine cih, lê yên ku wekî zarokên temenên wan 6–12 salî ne, zarokên Koroya Mezrabotan vê berpirsiyê di xwe de dîtine û ji bo ku her kes xwedî jiyaneke hevpar û azad be, bi hunera xwe bangî mirovahiyê dikin.

Huner bi serê xwe ji bo guherîna mirov, ji bo hişyarbûna mirov cihekî pir girîng digire. Bi çi awayî dibe bila bibe, huner bandorê li ser mirovan çêdike.

Li bakurê Kurdistanê cara yekemîn e ku zarokên wekî Gulên Mezrabotan li ser çand û hunera kurdî li Navenda Çanda Mezopotamyayê hunermendiyê dikin. Têgihîştin ku hunermendî berpirsî ye, ronîkirina civakê ye, wê jî heta dawiyê bi kar tînin.

Divê her kes hay ji berpirsiya xwe hebe çi ji destê wan tê bike ku di rojên pêş de daxwazên zarokan bînine cih. Heke ew zarok vê berpirsiyê di xwe de dîtin û berpirsiya xwe anîn cih, em çima dengê wan nebihîzin!

METÎN AKSOY

ÇAVDÊRÎ

AMED TIGRÎS



Dostê dijmin û dijminê gelên kurd: Barzanî û Taabanî

Gelek reng û cureyên nexweşiyê hene. Mebesta min ne cureyên nexweşiyên fizîkî ne, nexweşiyên siyasî ne. Di lîteratura siyasî ya navneteweyî de, li van nexweşiyan navên wek oportonîzm, revîzyonîzm, nîhîlîzm, kozmopolîtîzm û hwd. hatine kirin. Bi zimanekî sivik mirov dikare wiha bibêje; kariyerîzm, tengfikirîna komekî, herêmî, eşîrtî, bi xwe û bi hêz û bi gelê xwe nebawerî, parastina berjewendiyên komekî, xwe wekî gel an jî netewe biçûk dîtin, bêşexsiyetbûn, li hemberî partî an jî grûbên mûxalefet û desthilatdariyê kîn û rika siyasî û hwd.. Ev nexweşiyên wiha hema hema mirov dikare li her welatî di nav hêzên siyasî de bibîne. Ev gelek normal e ku di nav hêzên kurdan de jî hebin. Lê pêwist e ku mirov li pîvan, pile û deraxa wan binêre.

Belê di nav kurdan de ev nexweşî di pile û deraxa herî mezin de gelek caran xwe di pratîka jiyana siyasî de daye nîşandan. Bi taybetî li başûrê welat ji 30–40 salan ve dem bi dem ev derdikeve holê û niha ev kîn û rika siyasî di vî perçeyê welatê me de, di navbera Barzanî û Talabanî de digihîje ta pileya îxanet û xwefiroşiyê. Hejarbûna wan a neteweyî, bi xwe û bi gel nebawerbûn û ruhê wan ê koletiyê dilê wan reş û çavên wan tarî kirine. Di rekabeta siyasî de kîn û rika wan a feodalî û ruhê wan ê kole, careke din ew xistin hembêza dijminê barbar. Li darê dinyayê tu kesî li ser navê nîştimanperwerî û siyasetê rezaleteke wiha nedîtiye ku mirov di rekabet û têkoşîna siyasî de, bi dijminê xwe re bibe yek û êrîş bike ser hêza li hemberî xwe. Bi dijminê xwe re bibe yek, bajarekî azad dagir bike û li wir ala dijmin rabike. Pêşmerge û artêşa Saddamê Faşîst bibin dost û bira û mil bi mil li bajarê Hewlêrê kontrolê bigirin destê xwe. Ev artêşa faşîst a ku Kurdistan sotan, bi hezaran kurd kuştin, di carekê de li Helebçeyê pênc hezar kurd bi jehrî qelandin, ji çar hezarî bêhtir ji eşîreta Barzanî jin û zarok kuştin û heta niha tu kes nizane ku hestiyên wan jî li ku hatine veşartin. Ev artêşa barbar îro hevkar û dostê mala Barzanî ye? Mirov ji xwe dipirse, gelo PDK li dijî kê şer dike, dijminê gelê kurd kî ye? Talabanî û partiya wî ne an jî Saddam û dewleta Iraqê ne? Madem ku PDK û Barzanî bi Saddam re ne, Hêza Çakûç heta niha li wir çi dikir?

Hevkariya PDK û Saddam planeke piralî û dûr û dirêj e. Bi çûna Şevket Kazan a Iraqê re ev plan di navbera Iraq, Tirkiye û KDP de pêk hat û îro ew xistine pratîkê.. Niha pêngava yekem a vê planê di pratîkê de bi kar anîn û ev jî, ji navê rakirina YNK û Talabanî ye. Pêngava duyem a vê planê jî, ji navê rakirina PKK'ê ye. Piştî ku YNK ji navê hat rakirin, vê carê Tirkiye, Iraq û PDK dê bi hev du re vegerine ser PKK'ê, Îran jî, bi hêsanî dikare di vê plan û lîstika han de cih bigire, lê dijberiya wê jî bi Iraq û Amerîkayê re heye. Armanca hemûyan di cîhekê de digihêje hev û dibe yek: Têkbirina doza kurd a neteweyî. Lê, di hinek waran de berjewendiyên wan cuda cuda ne û dijberî di nav wan de derdikeve û tên hemberî hev du. Niha berjewendiyên Tirkiye, KDP û yê Iraqê yek in, ev jî şikestina bizava kurd a nîştimanperwer û şoreşger e. Amerîka jî vê yekê dixwaze, lê ne bi Saddam re. Amerîka dixwaze Saddam li derî planeke wiha bimîne. Ji ber vê yekê ye ku Amerîka û Rojava hevkariya PDK, Iraq û Tirkiyeyê di cih de nabînin, bi awayekî bêdeng û dudilî lê temaşe dikin. Dikarin formuleke din jî bibînin.

Pêwist e ku hemû rêxistin, dem û dezgeh û kesên nîştimanperwer û şoreşger, bi hemû zanebûn û îmkanên xwe yên madî û manewî li hemberî vê firotina kurd û Kurdistanê bi awayekî aktîv helwestê bigirin û çalakiyan li dar bixin. Di demeke gelekî kurt de bereyeke nîştimanî pêk bînin. KDP û YNK'ê rexne û protesto bikin. Bi taybetî jî bangê li PDK'ê bikin ku ew rojek zûtirîn dev û dest ji dostaniya Saddam û Tirkiyeyê berde û cihê xwe di nav hêzên Kurdistanê de bigire. Divê ew bizanibin ku bi Saddam re destxistina bajarê Hewlêrê ne serkeftin e, têkçûneke dîrokî ye. Mirin e.

‘Jiyaneke paqij hatiye afirandin’

Serokê Enstîtuya Kurdî Şefik Beyaz ji girtîgehê derket. Şefik Beyaz li ser axaftina xwe ya ku di sempozyûma “Li Ewrûpayê netewexwazî û nîjadperestî” kiribû de, hatibû girtin.
Beyaz li ser axaftina xwe sê mehan di girtîgehê de ma.
Hevalên me AYNUR BOZKURT û RAHMİ BATUR **li ser jinenîgariya wî û li ser jiyana li girtîgehê bi Şefik Beyaz re hevpeyvînek kirin.**

We kengê û çawa dest bi siyasetê kir? Di wê demê de rewşa welat û siyaseta kurdan çawa bû?

■ Gava ku min hê dest bi dibistanê nekiribû, ez hêj 4 an jî 5 salî bûm, min dest bi xwendina Quranê kir li medreseyê û min Quran qedand.

Gava ku min dest bi dibistanê kir, min Mewlûd, Nûbar û Necrema qedandibûn. Bavê te dersa me dida (Ji Rahmi Batur re dibêje). Mamosteyê me bavê te bû. Tu wê çaxê tunebûyî. Di wê demê de me rihê welatparêziyê jê girt. Me dizanibû em kurd in, lê me wateya kurdîtiyê nizanibû. Lê bingehek di me de hate avêtin. Ev jî, diviyabû her zarokekî kurd bi zimanê xwe bixwîne, bizanibe û bipeyive.

Dema ku me dest bi dibistana yekemîn kir, di wir de mecbûrî diviyabû em tirkî bipeyivin, mamosteyê me yê tirk wisa digot. Îcar ez difikirîm; mamosteyê min ê Quranê digot divêt hûn kurdî bizanibin û bixwînin, mamosteyê dibistanê jî digot tirkî! Ev çi ye, ez li ser gelek sekinîm. Vê yekê mejiyê min tevlihev kir. Heta sinifa sisêyan min nekarî ez bipişkêvim. Kesî jî ji me re nedigot. Birayekî min î ji min mezintir hebû, min jê pirsî ev çi ye? Wî hin tişt ji min re îzah kirin. Hingî ez pê hesiyam ku dibistanên dewleta Tirkiyeyê dixwazin, me ji çanda me, zimanê me dûr bixin. Ji bo wê dixwazin ku tirkî hînî me bikin û kurdî ji bo wê qedexe bû di dibistanê de. Wê demê ez pê hesiyam ku problemek di nav me û tirkan de heye.

Piştî wê hişyarbûnê we çi kir?

■ Dema ku me dest bi dibistana navendî kir, li wir hevalên me yên ji me mezintir hebûn. Hingî wê çaxê ew endamên PDK’ê bûn. Me navê PDK’ê bihîstibû, me dizanibû şerek li Kurdistana Başûr heye. Kurd li wir şer dikin li dijî rejîma Iraqê. Lê ji bo çi şer dikin, daxwaza wan çi ye, çi nîn e me baş pê nedizanî. Di wê demê de hevalên me yên ji me mezintir, gelek tişt ji me re gotin: Ji bo çi ev şer li Başûr heye. Mele Mistefa çi dixwaze, mirovekî çawa ye?

Yanê di 12 saliya xwe de, di nav siyasetê de min xwe dît, di siyaseta welatparêziyê de. Hingî weşanên wan hebûn ji me re dixwendin. Wekî alîgirekî PDK’ê me dest bi siyasetê kir. Bi pêşengiya wan hevalên ji me mezintir me civîn çêdikirin. Der heqê siyaseta kurdî de agahî me standin. Di salên 1968, 1969, 1970’yan de li Tirkiyeyê têkoşîna xortên Tirkiyeyê yên li zanîngehê dest pê kir. Hingî der heqê wan de jî me agahî standin. Lê daxwaziya wan û ya kurdên başûr çi bû, me nedizanî. Yan jî daxwaziya wan çi qasî nêzîkî hev in di mejiyê me de problem çêdikirin.

Di dibistana navîn de mamosteyekî me hebû, ji çepên tirkan bû. Der heqê wan de gelek agahî didan û ji me re pirtûkên zanistî û felsefî dianîn, bi me didan xwendin. Lê hevalên me yên alîgirê PDK’ê kêfa wan ji wî mamoste re nedihat; ew çep bû. Em li vir ketin şupheyê, şikê. Me digot ev jî şoreşger e û ew jî şoreşger in. Çima ji hevûdu hez nakin.

We ji bo çareserkirina vê nakokiyê çi kir?

■ Me xwest ku em êdî bi xwe, bi serê xwe ji xwe re riyekê bibînin. Xwe bi wan hevalan, an jî bi PDK’ê ve girê nedin. Têkiliya me bi PDK’ê re jî hebû, me ji PDK’ê jî hez dikir, alîkariya wê jî dikir lê êdî me nedixwest em bi tenê bi wê ve werin girêdan. Têkiliyên me wê demê bi kesên din re çêbûn. Bi yên ku ji wan re digotin Şivancî re. Yanê bi alîgirên Sait Kırmızıtoprak re. Ew hatin bi me re têkilî danîn. Em 13–14 salî bûn û me tiştên nû bihîstin, em hîn bûn. Di sinifa sisêyan a dibistana navîn de riya me romê dihesibînim. Gelek caran ez hatim girtin, lê wisa dûvedirêj ez di hundir de nemam; 3 meh, 4 meh, 2 meh... Ji aliyekî ve ez berpirsê fakulteyê bûm, yê Fakulteya Edebiyatê. Du sal û nîv jî min berpirsiya fakulteyê kir.

Di navbera jiyana hepsê ya beriya 12’ê Îlonê û ya îro de çi ferq hebû li gorî we?

■ Tabî welatparêzî û siyaseta wê demê û vê demê, gava mirov dide ber hev ji gelek aliyan ve ji hev cihê ne. Wê demê jî partî hebû, me di bin pêşengiya partiyekê de siyaset dikir, em têdikoşîn, di nav livbaziyan de me cih digirt, lê tu encamek dernediket, yanê digel wan xebatan, digel wan hewlan tu encamek dernediket. Ji ber vê jî zêde tam nedida. PKK beriya 84’an jî hebû lê siyaseta piştî 84’an û beriya 84’an ne wek hev in. Lewre wan însanên ku piştî 84’an di nav siyasetê de xwe didît, di nav xebata welatparêziyê de xwe didît encama wî didît, yanê gelek eziyet dikişand, gelek muşkulat dikişand, li hepsê an li derveyî hepsê, gava ku encamek didît tamekê jê distand. Vê tamê, rihê wî yê welatparêziyê xurtir dikir. Dehf dida nav xebatê. Baweriya wî xurt dikir. Têkiliya wî ü hevalan xurtir dikir.

Dema em li hepsê bûn me baweriya xwe diparast, em lê xwedî derdiketin, lê me xebateke rêkxistî nedikarî li hepsê bidomanda. Piştî 1984’an wiha nebû. Însanên di hundir de, hem baweriya wan bi xwe zêdetir bû, bi hevalên xwe zêdetir bû, bi rêkxistinê zêdetir bû. Vê yekê, însanên di hundir de li ser piyan dihişt. Ji her aliyî ve; ji aliyê siyasî ve, manewî ve... Tiştekî balkêş ku min dît, belkî di teva hepsan de tune ne, ew girtîgehên ku însanên PKK’yî tê de ne, jiyana welatparêzî li wir jî heye, wekî derve. Belkî jî derve jî çêtir heye. Yek, jiyaneke rêkxistî ye, jiyaneke paqij e. Di wê jiyanê de mirov hewayeke paqij distîne. Mirov her dem, her saniye xwe nû dike, wê îm-



Carekê eskerekî pirsî, got:
“Komûtanê min li vir ala PKK’ê heye. Ev ne qedexe ye, divê wan ranekin? Portreya Apo heye. Ev qedexe ne, divê em wan rakin.” Komûtan deng nekir. Esker cara duduyan pirsî, qomûtan pê re qeherî û got: “Ne qedexe ye, tu nikarî destê xwe bidî wan.”



kiliyeke xurt, têkiliyeke baş û têkiliyeke têr, ji her aliyî ve bi girtiyên wê derê re hatibû danîn, ji aliyê hevalên welatparêz ve. Bi munasebeta vê têkiliyê gelek agahî jî hatin ji me re. Yanê PKK bi navekî baş, bi awayekî qenc dihat naskirin li wê derê.

Gava însan hatine wê derê bi awayekî neqenc PKK zanîne, lê bi vê munasebeta têkiliyê ev nêrîna wan, dîtina wan guheriye, bi çavekî qenc li PKK'ê dinêriyan. Ev yek.

Ya duduyan têkiliyên hevalên welatparêz û çepê tirkan gava ez çûm, beriya çûna min a wê derê nexweş bûye, heta nexweşiyek jî derketiye, pev çûne, wan jî, kesên ji çepên tirkan ji wê derê avêtine der. Lê piştî mudaxeleya hevalên Sağmalcılarê ev nexweşîn rabû, di navbera wan de têkiliyeke germ çêbû û otorîteya partiyê ji aliyê wan ve jî hat naskirin. Îdareya girtîgehê otorîteya wê blokê nas kiriye, têkilî bi vî awayî hatiye danîn. Lê çepên tirk nexwestine ku bi vî awayî nas bikin! Ji ber wê nexweşiyek çêbûye. Lê ev nexweşîn dû re ji holê rabû.

Têkiliya girtî û îdareyê çawa bû û we çawa dît?

■ Ew bloka ku em lê diman, bîst mirovên siyasî hebûn li wir, belkî nîvê wî welatparêz bûn, ên din ji çepên tirkan bûn. Lê blok li ser navê PKK'ê dihat naskirin, ji aliyê îdareyê û jandarmayan ve jî. Nêzîkî 60–70 esker bi qomûtanên xwe ve dikevin hundir ji bo lêgerînê. Li her koxûşê, li her odeyê postera A.Öcalan heye û ala ERNK, ARGK, PKK'ê heye, tev jî mezin in. Qomûtan dikevine hundir li ber wê alê rêz digirin. 20 însan hene di hundir de, qomûtan rêz digire! Çima rêz digire?! Carekê eskerekî pirsî, got: "Qomûtanê min li vir ala PKK'ê heye. Ev ne qedexe ye, divê wan ranekin? Portreya Apo heye. Ev qedexe ne, divê em wan rakin." Qomûtan deng nekir. Esker cara duduyan pirsî, qomûtan pê re qeherî û got: "Ne qedexe ye, tu nikarî destê xwe bidî wan."

Mînakeke din bidim. Di lêgerîneke din de jî, aleke eniyê bi dîwêr ve zeliqandine. Aliyekê wê ketibû. Qomûtan hat, bi destê xwe, rabû bi bandê, ew pê ve kir. Îcar qomûtan qey mirovekî zehf demokrat bû, ji bo wî bû, na! Mirovekî zehf însan bû, ji bo wî bû, na! Ji me ditirsiya, na! Li wir otorîteyek hatiye danîn. Li wir jiyanek hatiye danîn, jiyaneke nû. Ev jiyan ne tenê ji aliyê welatparêzan ve tê nasîn, ev jiyan ji aliyê dijmin ve jî tê nasîn û tê qebûlkirin. Ev tiştekî zehf girîng e. Yanê rêzgirtina wî qomûtanî wateya wê ev e. Ne ku kêfa wî ji wê alê re dihat û rast kir.

Wekî din li wê derê serpêhatiyên we yên balkêş çêbûn gelo?

■ Jiyana min a navbera 1968'an heta 1980'yan di nav gel de bû, yanê di nav gundiyan de, karkeran de bû. Ji ber vê yekê jî min gel bi her awayî baştir û çêtir dinasî. Lê piştî 1985'an yanê piştî ku ez derketim derve, giraniya xebata min li ser çand, ziman û her wiha di nav rewşenbîran de borî. Ji ber vê jî têkiliya min a bi gel re bi awayekî hate birîn. Rewşenbîr jî parçeyek ji gel e, lê belê di rastiya xwe de têkilî ji aliyekî ve hate birîn. Ji ber vê yekê giyana xelkê; karkerek, gundiyek, dikandarek, şivanek yan jî dizek giyana wî çi ye, mejiyê wî çi ye, min baş nedizanî. Lê di hepsê de min gelek tişt dîtin. Ez dikarim bibêjim ku ez gelek tişt hîn bûm. Ez dixwazim mînakekê bidim. Dizekî kurd hatiye girtin, gelek hene ji wan. Ev, dizekî profesyonel e, li Stanbolê dixebitî, şebekeya wan heye, bi awayekî kolektîf dixebitîn. Yanê bi rêkxistinî dixebitîn ew jî. Mejiyê wî dizî gelek dixebitî, xebata rêkxistinî çi ye, çi nîn e baş dizanibû. Min digot qey mejiyê dizan zêde naxebite. Min li wir dît ku mejiyê dizekî, heke dizekî rêkxistinî be, wekî mirovekî siyasî yê rêkxistinî dixebite. Tiştekî zehf balkêş û xerîb hate ji bo min.

Welatparêzî çi ye nizane, kurd e, navê partiyê jî bihîstiye. Çend ji wan însanan me anîn, hatin. Du meh me programek çêkir, ji bo ku em wan bigihînin yanê ji aliyê welatparêzî û siyasî ve. Min dît ku mejiyê wî, ji mirovekî ku li zanîngehê dixwîne zêdetir dixebite. Însanekî ku li zanîngehê dixwîne, tiştên ku tu di nav salekê de bidî wî, bi serê wî bixî, wan tiştan di nav du mehan de dikarî bixî serê wî dizî. Yanê têgiha wî, ji mirovekî xwendevan zêdetir min dît. Ji ber çi?

Mesela du însanên me yên din jî hebûn, ji zanîngehê bûn lê pêlekê di nav çepên tirkan de cih girtine. Yekî ji wan di tibê de dixwend. Heval sê meh pê re xebitîne, du meh jî ez pê re xebitîm. Perwerdekirina wî dizî û ya ewên din me da ber hev, gelek ferq heye. Zanîna wî dizî piştî du mehan ji yên din zêdetir bû. Heke jiyana însanan di nav gel de be, têgiha wî zêdetir dibe, serê wî zêdetir dixebite. Heke ji gel dûr be, têkiliya xwe ji gel qetandibe têgiha wî jî kêm dibe. Di dawiyê de ez gihîştim vê encamê.

Gelo hûn dikarin li ser plan û programên enstîtuyê jî hinekî bisekinin?

■ Me gelek plan û program danîbû ber xwe. Hin ji wan hatin cih lê mixabin bi temamî nehatin cih. Gelek problemên me jî hene, lê ji bo me problema herî mezin nebûna kadroyên gihîştî yanê akademîk in. Ji ber nebûna kadroyên akademîk em nikarin projeyên xwe bibin serî. Her çiqas problemên aborî jî hebin, lê dema kadroyên akademîk hebin, dikarin problema aborî jî ji holê rakin.

Vêga li pêş me projeya herî mezin wek hazirkirina ferhengeke mezin dixuye. Ferhengên ku heta vêga hatine hazirkirin, mirov nikare ji wan re bibêje akademîk in. Hema bi giştî mirov dikare bibêje ku peyv berhev kirine. Ferheng ne peyv berhevkirin e. Ji bo hazirkirina ferhengê em dixwazin ji parçeyên din ên Kurdistanê bi vî karî re eleqedar însanên akademîk bînin vê derê. Ev xebat belkî di demeke dirêj de pêk were, em lê dixebitin ku zûtir çêbe.

KURTEJIYANA ŞEFİK BEYAZ

Ez di sala 1956'an de, li gundekî Bedlîsê hatime dinyayê. Oleka Jor e navê gundê me. Min li wir dest bi dibistanê kir. Pênc salan min li wir xwend. Piştî ku min dibistan qedand, ez hatim Bedlîsê û min dibistana navîn û lîse jî li wir qedand. Piştî wê ez çûm Erziromê, ji bo xwendina zanîngehê. Ev jî çar salan dewam kir, 1978'an jî zanîngeh xelas bû. Di wê salê de min dest bi xebatê kir, wekî karker. Dû re me dest avêt sendîka ava kir; DİSK. Sê sal min berpirsiya DİSK'ê kir li wê herêmê; Agirî, Qers û Erziromê. Di wê salê de jî, ez ketim navenda sendîkayê, yanê bûm endamê navendê û piştî wî qasî 6 meh wekî berpirsê sendîkayê, li Egeyê xebitîm. Bi kurtahî sê sal jî jiyana min a sendîkatiyê derbas bû. Piştî wê jixwe di 1980'yî de derbe çêbû. Me xwe da alî, em revîn a rast.

Piştî çend mehan ez hatim girtin, bi qasî çend mehan ez di hundir de mam û ez hatim berdan. Piştî berdanê ez şandim eskeriyê. Min 16 mehan jî eskerî kir ji dewleta romê re. Tiştê herî ku li min zor tê, ev e. Piştî ku eskerî qediya, çend meh ez li Tirkiyeyê mam. Dû re jî em derketin derve bi malbatî, di sala 1985'an de. Maliya min wê çaxê mamostetî dikir, dev ji mamostetiyê berda, bi zaroyan re em derketin. Derketina me jî bi serê xwe macerayeke dûvdirêj e.

Di navbera 1985–1992'an de em li derve man. Di sala 1991'ê de 6 mehan berî min zarok zivirîn vê derê. Di 1992'an de, serê 92'an bû bawer dikim, ji bo Rojnameya Welat ez jî vegeriyam.

Pêlekê di Rojnameya Welat de, pêlekê jî di Rewşenê de ez şixulîm. Piştî wê me dest avêt karê ji bo avakirina Enstîtuyê. Enstîtu ava bû. Demekê wekî endamê enstîtuyê ez xebitîm, piştî şehîdkirina Apê Mûsa jî, di Kongreya Yekemîn a Enstîtuyê de wekî serokê enstîtuyê ez hatim hilbijartin. Ji wê demê heta niha jî, 4 sal e ku ez serokatiya enstîtuyê dikim.

Kedkarekî şoreşê: Seydayê Tîrêj

Gelo ma kurdperwerek heye ku ji saz û awazên dengbêjên navdar "Ey bilbilê dilşadî", "Qulingê min", "Ez bi xwe pir ewle me", "Cana tu naz û gewr î" guhdarî nekiriye û di dawiya van helbestan de navê "Tîrêj" nebihîstiye?

Peyva "şoreşê", rast e peyveke serbixwe ye, lê gava ku mirov dadikeve gêra naveroka vê peyvê, wê hingê xweş diyar dibe ku ev peyv, wekî ku li cihê xwe diyar dibe, di kirinê de berfireh û bi rengekî dîtir e. Her bizavek, her serhildanek, yan jî her xwepêşandanek çi gelêrî û çi jî bi armanca çînayetî gava ku tê kirin, wisa rût û tisî, bêxeml û rewş be, jê re "şoreş" nayê gotin.

Li darketina bizavekê yan jî serhildanekê li ser bingeheke zanistî ya bi rêkûpêk, birêbaz û bipeyrew û bi hemû şaxên xwe ve gava ku ev bizav hate xemilandin, wê hingê ji wê bizavê re bi duristî "şoreş" tê gotin.

Rast e, di kawdanên (şertên) cîhana me ya îroyîn de û bi taybetî li Rojhilata Navîn, her çende şoreşgerê çekdar derzika pişta şoreşê ye jî, nivîskar, helbestvan, dengbêj, sazbend, şanoger û hemû hunermendên mayî jî, parsûyên vê derzikê ne. Ango, fişeka devê tivinga yê şoreşger in, xeml û rewşa şoreşê ne. Ji ber vê yekê mafê van daholkut û zirnevanên govenda gelêrî nayê paşçavkirin û divêt neyê paşçavkirin.

Bi salan e ku kedkarên govenda gelêrî (bêyî hîç berjewendiyeke taybet) bi qêrîn û bi halan in. Bi salan e çi gava ku xebatkarek, şoreşgerek li newal û geliyên xwe, yan jî di zindanên dagirkerên direndane de bi ser axa bav û kalan de dev û dev diketin, van kedkarên govenda gelêrî bi saz û awazên xwe, bi pênûs û helbestên xwe ew digihandin rêza karwanê nemiran û di nav gel de heta bi sermedî wan jîndar dikin. Bi salan e ku awaz û xweşxwanên şoreşgerên xwe yên serxwebûn û azadiyê ku li seranserî cîhanê belav dikin.

Helbestvanê govenda gelêrî

Lê mixabin, belê sed mixabin ku bi salên dûr û dirêj, ji ber nebûna bizaveke ku mirov karibe jê re "şoreş" bibêje, wekî hemû ked û westana gelê kurd, ked û westana van kedkarên govenda gelêrî jî, di nav mij û moranê de nadiyar û winda bû.

Yek ji van kedkarên govenda gelêrî yê sereke jî Seydayê Tîrêj e. Gelo ma kurdperwerek heye ku ji saz û awazên dengbêjên navdar, ên wek Mihemed Şêxo, Şivan Perwer, Seîd Gabarî, Qadir Silêman û yên mayî, "Ey bilbilê dilşadî", "Qulingê min", "Ez bi xwe pir ewle me", "Felekê hoy felekê" yan jî "Cana tu naz û gewr î wekî keja li Amed, Tu yî Xeca çelengî ez im îro Siyamend" guhdarî nekiriye û di dawiya van helbestan de navê "Tîrêj" nebihîstiye?

Jînenîgariya Seydayê Tîrêj...

Di sala 1923'yan de li Başûrê Biçûk, li gundekî Qamişlokê ji dayik bûye. Navê wî yê durist Nayifê Heso ye. Di heft saliya xwe de, li cem seydayekî welatperwer, bi navê Mele Îbrahîmê Golî dest bi xwendina ayînî kiriye.

Ji ber zîrekî û jêhatîbûna wî, Mele Îbrahîmê Golî berê wî dide dibistanê. Her wisa, helbestvanê me yê diltenik û dilovan, di çardesaliya xwe de (1937) li Amûda rengîn dest bi xwendina dibistanê dike û xwendina xwe ya seretayî li wê bi dawî tîne û yekser beşdarî partiya "Xoybûn"ê dibe.

Wê hingê li Başûrê Biçûk bi serperiştiya Elî Şiwêş partiya "Xoybûn" hebû. Navdarên wekî Hesen Hişyar, Cegerxwîn, Qedrîcan, Osman Sebrî û Dr. Nûredîn Zaza û hwd. endam û kargêrên vê partiyê bûn.

Her ji vê salê û pê de mamosta Tîrêj dest bi ristina helbestan dike. Çend helbestên wî ji layê Dr. Kamûran Bedirxan ve di kovara "Roja Nû" de têne belavkirin.

Di sala 1952'an de ji layê desthilatdariya Sûrî ve, digel berhema xwe ya salane û nebelavkirî tê girtin. Di sala 1989'an de yekemîn dîwana wî bi navê "Xelat" li Swêdê hate weşandin. Di payiza 1990'î de jî, duwemîn dîwana wî bi navê "Zozan" li Şam'ê derçû. Ji bilî helbesteke dirêj bi navê "Sîpan û Perwîn" ku ji 376 malikên durêzî pêk hatiye, ev dîwana wî ya dawî li ser sê biran dabeş bûye.

1. Birê evînî: 24 Helbest.
2. Birê xweşxwan û welatperwerî: 38 Helbest.
3. Birê şînê: 8 Helbest.

Her wisa digel Mewlûdeke bi kurmancî gelek destnivîs û serpêhatî ji bo çapê amade kirine.

Hejî gotinê ye ku Mamosta Tîrêj, di warê ristina helbestî de digel Cegerxwîn (kêm zêde) hevparê yek fêrgehê ye. Ew jî helbestên xwe ne li ser kîtan (jimar, bizav, deng), li ser hejmartina movikan (hece) amade dike.



Mamosta Tîrêj, di warê ristina helbestî de digel Cegerxwîn (kêm zêde) hevparê yek fêrgehê ye. Ew jî helbestên xwe ne li ser kîtan, li ser hejmartina movikan amade dike. Lê Cegerxwîn gelek helbestên xwe li ser kîtan, ango li ser şopa Melayê Cizîrî pêk anîne.

Gerçî, tevaya helbestvanên klasîkî yên Başûrê Biçûk li ser jimara movikan helbestên xwe amade dikin, lê tenha Cegerxwîn gelek helbestên xwe li ser kîtan, ango li ser şopa Melayê Cizîrî pêk anîne.

Di encamê de, digel daxwaza me ya jiyaneke şad û bextewer bo helbestvanê kurdperwer Mamosta Tîrêj, ji bo bîranîna salên raborî, bi çend malikên helbesteke ku ew bi xwe jî gelek jê hez dike, emê peyva xwe bi dawî bn in.

Cana, j' evîna te îro bi êş û nexweş im ez
Ger ku te nabînim timî bêfikr û hiş im ez
Wê pencerê veke reşperdê tu ji ser hilîne
Dilgirtiyê dêmê gulî du çavên reş im ez

Îro di evîna te de ola xwe me bi der da
Mizgeft û kenîşt ji bo te me tev bi ser da
Va xirqe û bendik ji gerden xo vebestin
Wek sofiyê Zerdeşt ku li dergehê Laleş im ez

Ax û klîşên te li ber çavên min in şev û roj
Nêzîka te bi min bihişt e, dûra te bi min doj
Çend sal e hemî ji umrê min beyhûde bûrîn
Bûm kalê zemana va bi gopal dimeşim ez

Va sondê didim dîsa bi wê soz û qerarê
Heta neweşin pelên min rê dûr bî ji darê
Ax û kesera Tîrêj ne bes li darê dinya
Heta bi mirinê dê xem û derdan bikêşim ez

DILDAR ŞEKO

ÇALAKÎ



● **08.09.1996 Yekşem**
Li NÇM'ê: Hefteya bîranîna Yılmaz Güney, konsera Koma Çiya û belgeweriya Yılmaz Güney (Derhêner Ahmet Soner).
Li NÇM'ê: Beşa Hunerên Dîtbarî fîmê Yılmaz Güney "Düşman" Dijmin nîşan dide, saet:18.00
Li EKM'ê: Fîlmê Charlie Chaplin, "Büyük Diktatör" (Dîktatorê Mezin), saet: 19.00
● **10.09. 1996 Sêşem**
Li NÇM'ê: Fîlmê Yılmaz Güney "Arkadaş" (Heval) tê nîşandayîn, saet: 18.30
Li EKM'ê: Fîlmê Ayzenştayn "Zarokiya Ivan", saet: 19.00
● **11. 1909. 96 Çarşem**
Li BEKSAV'ê panel: "Di Pirsgêreka Kurdî de Hevdîtin û Pêşveçûn", beşdar: Akın Birdal (girtî ye), Fettullah Erbaş, Yılmaz Ensarioğlu, Selim Okçuoğlu, İsmail Sarıoğlu, saet:
● **12.09.1996 Pêncşem**
Li BEKSAV'ê: Fîlmê Costa Gavras, Missing (Winda), saet 18.00
Li NÇM'ê : Fîlmê Yılmaz Güney "Endişe", saet 18.30
Li EKM'ê : Fîlmê Costa Gavras, "Martial Law", saet: 19.00
● **18. 09.1996 În**
Li EKM'ê: Belgewarî: Kampa "Aucwhitz 1945", saet: 19.00
● **14. 09.1996 Şemî**
Li NÇM'ê konsera Koma Rojhilat, saet: 15.00, Teatra Jiyana Nû: "Zevîya Jiyanê", Saet 18.00

RÛDAN

Yılmaz Güney stûxwar ma



Yilmaz Güney vê hefteyê jî bû mijara çalakiyên mûxalîf. Gelek navendên çandê hefteya borî û vê hefteyê li ser Yılmaz Güney disekinin; ji bo bîranina Güney, gelek fîlmen wî yên bijartî tên nîşandayîn. Tiştekî enteresan heye ku rojên bîranîna wî û protestokirina 12 yê rezberê (îlonê) qelibîne nava hev. Mînak: Şirîkê Yılmaz Güney ê Xelata Cannesê Costa Gavras jî bi fîlmên xwe "Windayî" "Kayıp" û "İdareya Awarte" di van çalakiyan de cih distîne. Evrensel Kültür Merkezi (EKM) di hefteya borî de gelek fîlmên Güney nîşan dabûn û vê heftêya jî giranî dayê ser derbeya 12'yê rezberê (îlonê). Di van çalakiyan de giranî li ser fîlmên Costa Gavras e.

NÇM'ya Stenbolê giraniya çalakiyên xwe yên vê hefteyê ji Güney re veqetandiye. Di van çalakiyan de ya herî girîng belgewariya jiyana wî ye. Fîlm bi destê derhêner Ahmet Soner hatiye amadekirin. Lê esas berpirsê vî karî îsal ne li holê ye. Behs li ser Weqfa Güney e. Li gorî agahiya ku me ji rayedarên weqfê stand ev e: "Daxwaza me ew e ku em van çalakiyan li cihekî mezin çêbikin. Lê belê îmkan nîn bû. Me haziriya xwe li ser Teatra Küçük Sahneyê çêkiribû, lê belê ev proje jî ji ber hin tengasiyan nemeşiya. Ji ber vê yekê jî êdî em dixwazin ku cihekî wisa bi dest bixin. Xebat êdî li ser vê bimeşe. Êdî îsal ji me derbas bû."

DÜZGÜN DENIZ

TÎŞK

LERZAN JANDÎL



Kinkor

Beno ke tenê kesî kinkorî meşinasnê. Na zaf normal a. Kinkor yew vaş o. Kurmanciye de hema hema her ca es to. Bîna xo gelê weş a. Eke amnanî mal dawar şono waran, kinkor çereno. Neye rê jî şit, mast, do, ron, toraq, pendîrê mal û dawarî ra boya, tamê kinkorî ênо. Eke gegane mi rê welat ra pendîr ênо, sebeta boye û tamê kinkorî, ez nê pêndîrî nêwena. Masayê ser ro nana ro, ke bîna dê bêro mi.

Bêguman şima nika persenê. Na meselaya kinkorî kotî ra veciye? Cayê na meselaye naca çik o? Ez bivacêrî.

Rojê mi yew şanika domanan zonê ma ra çarnêne almanî. La belê se ke ênо zanayene, ferhengê de zonê ma û almanî çîno. Naye rê jî mi waşt, ez verde nameyê kinkorî ebi tirtkî bivînê. Pêco jî, ferhengê tirkî û almanî ra nameyê deyê almanî doz kerî. Çi gêreno/cêreno.

Nameyê kinkorî bi tirkî qe yew ferhenî de çîno. Nê ferhenganê Kirmanckî–Tirkî de, ne jî ferhenganê Kurmancî–Tirkî de. Ma hurêndiya nameyê kinkorî ebi tirkî de çi esto? Îzahet es to. Yanê kinkor senêno, se aseno, pelê xo senênê û êb. Bêguman mesela teyna kinkor nêyo. Zaf nameyê, bingepersî est ê, ke maneya dînan, ebi tirkî nêyamo dayene. Hurêndiya daye de, nivisayena şikl û bîçîmê dînan es to.

Ez ked û emegê hevelanê ke ferhengî viraştê, kêm nêvînena. Kedê dînan qij qe nêvînena. Lewê mi de qed rê kedê dînan nêno peminayene. Çimke ez bi xo jî zana, ke no kar çiqa zamet û zor o, tengasiyê xo zaf ê. Mesela na niya. Mesela keso ke biwazo zonê kurmancan bimuso, ebi kamcî ferhenî şîkîno bixebetiyo? Bêguman ferhengê ke est ê,mardem şîkîno ci ra feyde bîvîno. Hema teyna feyde diyane, zêde nê.

Mi nayê ra ver jî rojnameyê Welatî de der heqê ferhengî de bîr û baweriya xo nivisnaybî. Ez rêyna nêwazena diqor kerî. La belê wunciya jî ez wazena ebi kilmiye tenê çiyan biyarî re zon.

Mordemî ke dest kerd karê, gere heqa ê karî de bêro. Eke no kar, karêde îlmî bo, karêde zanayene bo, heqa nê karî de amayene tayîna bena pêwîst. Hama na nazikiye hatanî nika nê (y) ama dayene. Şaranê asya de na musayene est a. Yanê heqa karî de nêamayene. Karî serê ra diyene, çiman ver eştene. Zerarê naye jî, ê kesê ke angorê nê karan musenê, oncenê ancenê.

Ferhengê ke hatanî nika viraziyê, mordem nêşîkîno bivurno. La belê eke mordem nînan newe ra çap keno, yan jî ferhenganê newiyan virazeno ganî karê xo ser ro rind bifikiriyo. Hênî bikero, ke heqa kedê xo bidêro. Yanê eke yew mordem ebi seran yew ferhengî ser ro xebetiyo, ked û emeg do, ganî çiyo ke vero jî ferheng bo.

Îhtiyaciya ma û ferherganê niyanêna zaf a. Waştena mi roşnabîranê ma yê kezon û ferhenî ser ro xebatînê ra awa, ke keremê xo nê karî cîdî bigêrê xo dest, berhemanê newiyan û xurtan bidêrê.

Ebi na hêviye û waştene, ez nikara hevalanê ke na der heq de xebetîne, serkewtene wazena.

Seba rojanê azad û rotiye, seba berhemanê xurtan. De hayde dest berzîme karê xo.

Meha bêyom

Dotira rojê çû mêrgê. Çar gurzên gihê li erebeya ga siwar kirin. Çawa destê xwe avêt gurzê pêncemîn kêma (werîsê ji gihê çêkirî) gurz çiriya. Qîriya ser lawikê xwe yî neh salî, banokî hilda ku li lawik bide, yekî bi destê wî girt. Zivirî.. Di cihê xwe de sar bû.



Ji yazdeh meha hez dikir lê ji meha giha çandinê hîç hez nedikir. Ev meh ji bo wî meheke bêyom bû. Deh rojan beriya gundiyan tirpan, dirmix, hors, çakûç, êge, masat û dezgehên xwe amade dikirin, hefteyek beriya gundiyan dest bi çandina gihayê kax dikir.

Êvaran bi madeyeke tirş û bêhneke teng dadigeriya malê. Dema di ber mêrg û zeviyên di deştan re derbas dibû ji bapîrên xwe re çêr dikirin:

–Ma hîç hiş bi bapîrên min re tunebûye, de binihêrin her kesî cihên deşt, şawî, xweşik standine, lê bapîrên min çûne cihê bi zinar, pal, kax, çiya girtine; di goran de nesitrin, ez di tirba wan...! De ezê bi vî erdê bêkêr çawa şad bibim, çawa hilberîneke baş hildim û pê zarok û zêçan xwedî bikim...

Dest didan ser kêlekên xwe û neçar dima. Li gorî wî sedema jiyana wî ya xerab bapîrên wî û erdê wî yê kax bûn.

Di civak û mijûliyan de dema qala erd, terş û gihê dibû wî stûyê xwe ditewand û bi dar û qirçikan erd vedikola. Carinan ji xwe re digot:

–Dê ezê îsal gihê neçinim. Çil rojan ji kê re şol bikim wê zêdetir dirav bi destên min bikevin. Xelk rojekê bîçerê berdide mêrga xwe, bi kedeke hindik, gihê diçinê... Ez çil paleyan berdidimê bi xisareke mezin dixesirim. Xelk bi min dikene.

Di wê mehê de tu caran dilê wî li keda wî geş nedibû. Di wê mehê de lawaz dibû, ji dirûvê mirovan derdiket. Tu havîneke bi dilekî fireh, bi çavekî vekirî li erdê xwe nedinihêrî.

Belê erdê wî kax bû lê ew kax û derdorên wê parçeyek ji bihuştê bûn; erd di navbera du newalan de ye, bi darên bizû û bîhokan xemiliye, di zinaran de carê dengê sewalekî dibe melodî.

Wê êvarê ji bo giha kişandinê xwe amade dikir. Jina wî ji bo emra wî amade bû. Tiştine bi qehir ji jina xwe re digotin:

Jinikê bi dengekî kelogirî gazinên xwe li mêrê xwe dikirin û digot:

–Çi bûye, ma dinya xera bûye, te dilê xwe jî reş kir yê me jî, her kes bi kêf û şahî ye, di vê mehê de her roj mal li me bûye dojeh...

–Keçê ji gundiyan yek şêx e, yek mele ye, yek qebîleya wî gur e, yekî bi ewantiyê nav daye, yek dewlemend e, yek diz e, zarokên almançî ne, pirî wan jî erdê wan gewr in... De ezê biçi bereda xwe bidim, tu jî ne ewqas tîtal î...!

–Pirî wan jî zarokên wan li çiyan e! Evên tu dibêjî tevde jî bi kêrî tu tiştî nehatine ta niha.

Dotira rojê çû mêrgê. Çar gurzên gihê li erebeya ga siwar kirin. Çawa destê xwe avêt gurzê pêncemîn kêma (werîsê ji gihê çêkirî) gurz çiriya. Qîriya ser lawikê xwe yî neh salî, banokî hilda ku li lawik bide, yekî bi destê wî girt. Zivirî.. Di cihê xwe de sar bû..

Mêvanên wî du keçik û xortek bûn. Tevde di bin dara bizû de rûniştin. Şervanan rewşa gundiyên wî û jiyana wî pirsîn. Bersiva wî ya pêşî dîsa bêkariya erdê wî bû. Şervanekê dest bi mijûlahiyê kir.

–Xalo, xwîna me ji bo vî erdî diherike wê di rojên pêş de ev zinar û xelexelên vî erdî bi milyonan bikin. Ev kevir û der dewlemendiya pêşeroja zarokên me ne..

Ji keçikan yekê lawikê wî ber bi sînga xwe ve kişand û ew di hembêza xwe de veşart û wiha got:

–Navê min Hêvî ye, lê di hêviyên me de hûn û jiyaneke bi rûmet dibişkivin..."

Ji wê rojê pê de ew li ser maseyan ji bepîrên xwe re duayan dike. Di axaftinan de dibêje, bepîrên min ji min re cihekî wekî xezîneyê hiştine.

JÊHAT GIMGIM

Şewitandina giya û çilo

Li gundekî Mûşê her sal dema ku payîz dibû lodên giya û kidasên çiloyên gundiyan dihatin şewitandin. Lê belê kesî nizanibû ku kî van dişewitîne. Gundî ji hev re baş bûn, ji hev hez dikirin. Ji ber vê yekê ji hev şik nedikirin.

Rojekê gundî gihîştin hev, gotin: "Ev kî ne lod û kidasên me dişewitînin û serê zivistanê me şerpeze dihêlin; pez û dewarên me bê pût (alaf) dimînin. Ev ne ji gundê me ne, hebe tune be ji gundine din tên."

Di nava xwe de biryar girtin û çûn ba meleyê gund, derdê xwe jê re gotin. Mele kir axîn û nalîn û got: "Ez jî pir bi ber dikevim, lê belê çi tê ji destê min? Pêwist e ku em bi şev yekî bidin ber lod û kidasan." Gundiyan jî gotin: "Em giş xwediyê kar in, dixebitin, wexta me tune ku em nobetê bigirin, ji kerema xwe re tu karibî nobetê bigirî, emê mehiya te bigihînin hev û bidin te." Mele got: "Ji bo xatirê we gundiyan, ezê daxwaza we bînim cih."

Meleyê gund sê çar şevan çû nobetê, wekî din li mala xwe raza. Çend şev derbas bûn, rojekê jina mele ji mele re got: "Xwedê jê razîbiyo ma çima tu naçî nobeta giya û çilo? Tu pereyên gundiyan distînî, ma ev helal e? Ku giya û çilo bê şewitandin tuyê çawa bersiva xwe bidî?"

Mele li jina xwe fetilî û got: "Meraq neke, tiştek bi giya û çilo nabe û nayê şewitandin. Ji wî aliyî de firêqet be. Heta niha ew lodên giya û kidasên çilo min dişewitandin. Tu jî zanî ku îsal çar pênc sal in em hatine vî gundî, em dikin ji birçînan bimirin.

Gundî fitir, zekat û ji bo xwendina li ser miriyan tiştekî nadin me. Min li wan wiha kir. Ji îro pê de tiştek bi çilo û giyayê wan nabe. Ezê jî mehiya xwe ji wan bistînim."

FELÎT ROJHAT ZAWAN

‘Gotin’ û ‘Özlemin gül sureti’

Ez bi xwe çapkirina gotaran wekî pirtûk girîng dibînim. Ji ber ku pirtûk bi hêsanî dikarin bêne peydakirin û her kes kare zû bi zû xwe bigihîne.



Gotin, navê pirtûka Serokê Parlementoya Kurdistanê ya li Derveyî Welat Yaşar Kaya ye. Ger ez ne şaş bim, ev yekemîn pirtûka wî ya bi kurmancî ye. Di pirtûkê de 53 gotar cih digirin, ji bilî hebekê tev di rojnameya Welat de derkeine. A din jî di kovara Nûdemê de hatiye weşandin.

Weşanên Nûdemê ew gotar dane hev û wekî pirtûk çap kiriye. Pirtûk ji 115 rûpelan hatiye pê.

Min berê jî ev gotarên birêz Yaşar Kaya xwendibûn. Digel vê yekê, ez dikarim bibêjim ku min li bêhnekê careke din ew gotar xwendin. Wan gotarên ku mijara wan ji hev cihê cihê ne, ez birim rojên Welat û bûyerên ku di wan deman de qewimîbûn.

Piştî ku Yaşar Kaya bû Serokê Giştî yê Partiya Demokrasiyê (DEP), dev ji nivîsîna ji Welat re berda. Heta wê çaxê min bi xwe jê pirsî ku ka çima nanivîsîne. Wiha gotibû min:

“Jixwe li me bi mane ne, bila ji ber nivîsên min tiştek neyê serê partiyê.”

Belê, wê çaxê me Welat di awahiya Özür Gündemê de derixist; Yaşar Kaya jî Xwediyê rojnameya Özgür Gündemê yê bi îmtiyaz bû.

Çendî ku gotarên di Welat de derketine, hin ji wan li ser rojeva wê demê ne jî, hin ji wan hîna jî aktuelbûna xwe diparêzin; wekî nivîsên bi sernavên “Ziman”, “Dîroka Me Kurdan Tarî ye”, “Medya kurdî ” û hwd.

Gotarine din jî hene ku tu car girîngiya xwe winda nakin; mîna “Ord. Prof. Şükrü Baban (Şukrî Begê Balanzade)”, “Fehmî Bîlal, Faîk Bucak, Seîd Elçî” “Şehîdê Gündemê Hafiz Akdemir” “Rewşen Saleh Bedirxan”, “Nemir Wedat Aydin”,“Hüseyin Deniz”, “Kekê Delal Musa Anter” û hwd.

Ez bi xwe çapkirina gotaran wekî pirtûk girîng dibînim. Ji ber ku pirtûk bi hêsanî dikarin bêne peydakirin. Gotar di quncikên rûpelên rojnameyan de dîmînin, her kes nikare zû bi zû xwe bigihîne wan û...

Di Welat de navê quncikê birêz Yar Kaya “Gotin” bû, îcar “Gotin” bû navê pirtûkê û careke din kete destê pirtûkhez û kesên ku jî xwendinê hez dikin.

Va ye li ser Apê Musa, Ferhat, û Hafız pirtûk hatin weşandin; bawerî ew e ku li ser şehîdê me yên din ên çapemeniya kurdî jî xebat bêne kirin.

Pirtûka duyemîn jî ku em li serê rawestin “Özlemîn gül sureti” ye. Ev pirtûk bi navê rojnamevanê şehîd Hafız Akdemir derketiye û Selahattin Bulut ew amade kiriye. Pirtûk, 223 rûpel e û li dawiyê cih ji wêneyên Hafız Akdemir re hatiye veqetan din. Weşanên Nûjen ew çap kiriye.

Selahettîn Bulut, berê jî pirtûkek li ser Hafiz bi navê “Gülüşün Özgürlüğümdür” amade kiribû.

Pirtûk ji pênc beşan pêk hatiye. Di ya pêşîn de cih ji nivîsên hevalên Hafiz re hatiye veqetandin, di beşa duduyan de nivîsên Hafiz ên Yenî Ülkeyê cih digirin, di beşa pêy wê de name tên. Di beşa çaran de “Çapemeniya kurd ji bo Hafiz Akdemîr çi got,” te û di ya dawî de jî “Çapemeniya Kurd” ji bo pirtûka “Gülüşün Özgürüğümdür” çi got, heye.

Wekî ku ji navê pirtûkê jî xuya dibe, pirtûk bi giştî bi tirkî ye, ji bilî nivîsên ku di Welat û Welatê Me de derketine û helbesteke Mamosta Baran.

Derbeya leşkerî ya 12’ê rezberê çawa ji bo Tirkiyeyê û gelê kurd mîlad e, çawa xaleke werçerxê ye, ji bo çapemeniya kurd jî ev wisan e.

Çapemeniya kurd piştî salên 90’î berdêlên giran dan û hîna jî dide. Ev tev bûn dîrok, nema ji bîr dibe.

Kurdan, di warê çapemeniyê de canên hêja “winda” kirin. Wekî Apê Mûsa, Hüsyin, Hafiz, Kemal, Nazım, Cengiz, Aysel, Ferhat, Sefyettin, Yahya, Çetin û hwd....



Va ye li ser Apê Musa, li ser Ferhat, li ser Hafiz pirtûk hatin weşandin; baweriya min ew e ku li ser şehîdê me yên din ên çapemeniya kurdî jî xebatên wisa bêne kirin.

Divê pirtûkên wisa, di bin destê nifşên nûhatî û yên ku bên de hebin. Bizanibin ku çapemeniya kurd gerew û bergîdaniyên çawa dane û dîsa bizanibin ku çawa di nav zeviya mayînan re bihurîne û çi bi dest xistine.

Mîna Selhattin Bulut, divê kesên din jî qet nebe xebatên bi vî awayî bikin û dilê şehîdên çapemeniya kurdî şad bikin. Destên te ter bin Selhattin Bulut.

ZANA FARQÎNÎ

Tawanbariya dîrokê giran e

MEDENÎ FERHO



Berxwedana kurdan, ji hêlekê ve ketiye rewşeke ku hemberî felsefeya xedarî, zordestî û mecalkeysiyê, şerê aştiyê û xweparastina biyolojîk. Ji ber ku hişmendiya Nietzcehe, di encameke radîkal de di cimcimê qafê serkêş û serdarê dewleta Tirkiyeyê de ku ew tev tov û bizrên mihacirî û qijlan in, çarmêrkî rûniştiye, pelax bûye, heye. Ev hişmendiya li derveyî mirovaniyê ye, ku her û her bi xurtî û propagandayeke mezin di nava komên xelkê de hatiye belavkirin. Vê şovenîzma gemarî ji salên 1908’an û bi vir de kok berdaye nava stana Anadolûyê û di nava xala deşt û çiyan de, di nava ra û tarayên ezayên laşê mirovên wî de tov û bizrên kizirî û kirnizî de dest pê kir, di dema sazîkirina komarê de bi hêz jiyan dît û hate meşandin.

Armanca vê hişmendiya kevneperest, serdestî, mezinatî yanê maqûltiya nîjada tirk bû. Daxwaz jî, nenasiya mafê jiyanê ji bo komên xelkên ne tirk û bi bêdengî, bi “lal û ebkemî” danqebûlkirina ‘begîtî’ û ‘efendîtî”ya tirkan bû.

Helbet padîşahê osmaniyan ên mîna Abdulhemîd jî, ji sûcê vê polîtîkaya li derî mirovaniyê ne bêpar in. Ew jî, bi qasî Jön Turkan tawanbar in. Ku em li dîroka dema Abdulhemîd dinêrin, bi kirinên polîtîk û bûyerên qirkirinê dinêrin, teva girêdayî sazîkirina dewleteke yeknîjadî ne. Li gorî ramangîrên tirk ên demê, komên xelkê yên ne tirk her û her bûne sedema destdirêjiya ewrûpiyan û bûne sedema leyistikên biyaniyan li ser axa împaratoriyê. Gerek e ev asteng, bi çi rengî be, bête hilandin. Lewre jî, jiholêrakirin, bi çi awayî be, ‘mûbah’ e û fetwa şêxê îslamê di vê der heqê de hebû ku dewletek yeknîjadî bête bidestxistin. Yan jî komên xelkê ne tirk, ne pirhejmarî bimînin û tirkîtiyê qebûl bikin, hingî ev sedema destdirêjiyê ji meydanê radibe.

Laz têk çûn... çerkez têk çûn... rûm têk çûn... ermenî têk çûn... kurd, di gel hemû helandin, qirkirin û koçberiyan li ser lingên xwe man...

Di nava leyistik û xapên polîtîk de gevizîn, talan bûn, ji cih û war dûr ketin, mirin, hatin qirkirin, careke din xwe parastin û heya vê serhildana 15’ê gelawêjê ku êdî ketiye qonaxeke serkeftinê, hebûna xwe domandin. Serkêş û serdarên dewleta tirk ên ji wî tov û bizrê kizirî û kirnizî hew dizanin çi bikin, hew dizanin çareseriyeke çawa bînin masetê. Lewre jî her roj bêhtirîn gotinên qurmiçandî û bê zad û bê tewaş ji devê berdevkên wan derdikevin. Îro tiştekî bibêjin, sibe tiştekî din dibêjin. Li soz û peymanên xwe xwedî derneketin di dîroka wan a dûvdirêj de jixwe heye, hewce nîn e em dabaşa wê bikin. Heya jê tê zorê dide kuştin, wêranî û xerakirinê.

Îro, ev hişmendiya ne hemdemî ku di nava liqat û aşêva xwezayê bi xwe de jî tune ye, li hemberî gelê kurd tê meşandin. Ev hişmendiya ne mirovanî û ne xwezayî, gelo wê berê komara Tirkiyeyê bide ku derê? Li hemberî firotin û pêşkêşiya dewletê ya parçe parçe, wê çi qasî li ser lingan bimîne? Gotineke pêşiyan heye, dibêjin: Xwediyê miriyan kor e...

Hêvî dikim hewceyî bi dirêjkirin û şîroveyê tune ye. Tê zanîn ku êrîşên barbarî û hovîtî her dem ji teref dîrokê ve hatine tawanbarkirin. Tawanbariya dîrokê giran e...

www.arsiv

Kera reş û serbaz

Gundiyekî kereke wî ya reş hebûye, lê zehf tor bûye tu kes nikaribûye nêzîkê bibe, da ku lê siwar bibe.

Rojeke biharê leşker têne gund ku tetbîqatê bikin li çiyê, ji gundiyan ker û hespên wan dixwazin. Xwediyê kera reş, dibêje: "Wele ezê kera xwe bifiroşim wan jê xelas bibim. Diçe ba serbaz dibêje: "Kereke min heye wisa nerm e, wisa bi hemdê xwe ye hema tam bi kêrî we tê."

Serbaz dibêje: "Bîne were ezê lê siwar bibim, binihêrim ka çawa ye."

Gundî dibêje:

"Wele bi tirkî nizane divê pêşî hûn wê hînî bi tirkî bikin. Pişt re lê siwar bin" Serbaz dibêje: "Ka emê çawa hînê tirkî bikin?"

Gundî dibêje: "Wele pir hêsan e, yekî biyan jî hat min dayê di navbera du rojan de fransizî hînî kerê kir." Serbaz pir kêfxweş dibe, dibêje wele ezê bibim bajêr, bêjim ew bi fransizî dizane, wê pereyekî pir giran bike.

Kerê hildide dibe çiyê, çend rojan pê re bi tirkî xeber dide, dibêje: "Wele êdî bi tirkî hîn bûye, ez lê siwar bibim ka çawa dimeşe."

Li kerê siwar dibe, ker serê xwe hildide li çiya û baniyan, li kaş û newalan dide lotikan, serbaz li ser kevir û axê kirûkaş dike cilên serbaz pirtî pirtî dike, tîne nava gund.



Serbaz radibe ser xwe dibêje:

"Zû gazî gundî bikin, bila were ezê wî bikujim."

Gundî dertê tê, hema pê re diçe ba kerê sê çar peyvan dibêje, tê cem serbaz. Dibêje:

"Ma wele ker dibêje "di nava ew qas leşker de min şerm kir, giştikan li min dinihêrî, ka ezê çawa hînî tirkî bibûma" divê li cihekî tenê be ku bikaribe hîn bibe."

Serbaz careke din kerê dide pêş xwe, hildide diçe. Piştî çend rojan dîsa tê nava gund îcar bi dengekî bilind diqîre: "Ka xwediyê kerê, bînin îcar ezê wî rastî bikujim."

Xwediyê kerê tê cem kerê hinekî disekine tê cem serbaz dibêje: "Wele serbaz dua bike ku tu nekuştiye."

Serbaz dibêje: "Çima?" Gundî wiha bersivê dide: "Wele dibêje serbaz dest avêtiye namûsa min, divê tu hema ji gund derkevî an wê bangî zarokên xwe bike, wê te li vir bikujin. Serbaz dihêle direve. Dema ku bi rê ve dimeşe jî dibêje: "Bila dinya alem diya min, jina min çawa bikin, êdî ez ker û hespên kurdan nastînim nastînim, lo wele nastînim bile nastînim!"

M. DAREBÎ

Sê bira

Sê bira bi hev re bûn, her sê birayan jî yana xwe di malekê da didomandin. Jiwan biraya yek; gurî ye, gerek e serxwe bixuirîne, yek jî av ji pozê wî diherike, dîvê serê kêlîkê pozê xwe paqij bike, yê din jî seqet e, ew lingê xwe îmkan tune divê rade. Rojekê paşayê mezin qasidekî dişîne mala wan. Qasid kaxiza xwe ya dirêj vedike û dixwine. Ev her sê birayên bi qirêj û bêhn bi wan ket wê roja înê bêne qesra paşayê mezin.; her sê bira bi hev re dibêjin: "Emê çawa bikin? Welehî wê paşayê mezin bi me bikeve." Yek dibêje: "Em herin", yê din dibêje: "Em naçin", lê cara dawî her sê bira difikirin, dibêjin: "Em herin", xwe didin hev du û diçin qasra paşayê mezin. Li ba paşa rûdinin heta derengiya şevê, aciz dibin, lê nikarin xwe rihet bikin û dibêjin: "Paşa ku emê herin." Yê ku serê wî gurî ye dibêje: "Paşa ezê ji te re tiştekî bibejim?!" Paşa lê dinêre dibêje: "Beje!" Ji bo ku serê xwe bixurîne derewekê dike û dibêje:

–Aşekî bavê min hebû, a haaa wisa dizîvirî.Bi her du destan serê xwe dixuerîne. Ê ku lîçka wî diherike, îcar ew dest pê dike: "Paşa ez jî tiştekî bêjim?" Paşa destûrê dide wî jî, ew jî dibêje:

–Wele şûrekî bavê min hebû haaa wisa bû. Bi destan pozê xwe paqij dike. Ma yê seqet çima bisekine êdî, ew jî destûrê dixwaze, paşa riya axaftinê dide wî, ew jî dibêje:

– Ê ev lingê min di diya derewînan... Ew ji lingê xwe radide.

AZAT ALTUN

XELAT... XAÇEPIRSA BIXELAT (32) XAÇEPIRS



Bersiva Xaçepirsa 30'an

Xaçepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 10 kesan belav bikin.
Xelata hejmara me ya 32'an pirtûka
Helîm Yûsiv "Mirî Ranazin" e.

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî adresa xwe ji me re bişînin.



Kesên ku xelata xaçepirsa 30'an, kaseta **Dilovan "Şerdikim"** qezenc kirine: **Kemal Yavuz / İzmîr,** Handan Kebude / İzmîr, **Remzi Kalhanlı / Urfa,** Welat Kapazan / İstanbul, **Hêjar Mezrabotan / İstanbul,** Mehmetşah Uzeyir / Batman, **A. Rahman Ağdaş / Mardin,**

Piştî / Nepijiyayî	1	Gihanekek	→	Kurt / Paytexta Azerbêcan	↓	Sazûman kar / Giyayekî bêhn xweş	↓	Simkoyê .... (wêne)	↓ Xulam
↳			Jin bira / Em pê dipeyivin	→ ↓	2	↓			↓
Hidrojen		Ilim	→					Kêra ku nabire / Term	→ ↓
↓	Sahne	→			. Gelek westiyayî / Xor, roj	→		↓	
Heyvane / Naveki mêra	↓	Agirbest / Meyweyek	→		5		3		
↳		↓	4	Qertafek / Arvan	→		Ji çêl û pez tê dotin / Lehiya berfê	→	
Ji aliyê hundir ve zik / Bajarek	→			↓		Beşek ji çongê	↓		
↳			Sodyûm		Notayek / Surwe	→ ↓			
Xwarina sereke / Xwe parastin	→		↓	Ser xanî	↓				
↳							6		



PEYVA VEŞARÎ →

1 2 3 4 5 6



'Bila serê dewleta me sax be!'

Destpêk rûpel: 16

Wey li wî ku çavên xwe girtin û xwe avêt nav wê gola pîsatiyê û ji xwe re çi revand... Yanê çawa heywanên ku ferxes dibin (têne xesandin) bêşexsiyet dibin, însan jî wexta ku fikr û namûsa wî çû, şerm û heya wî ji ortê rabû, bêşexsiyet dibe.

Serokê Amerikayê yê ku kuştin Kennedy, wî bi navê "Fezîlet" kitêbek nivîsandibû. Di kitêbê de mirovên ku Amerikay bi pêş ve birine, serok, wezîr û senator; têkoşîna wan, tengasî û astêngiyên ku derketine pêşiya wan nivîsandine.

Li vir fezîlet tune, rezîlet li pêş e... Li vir her kesek li gorî heyîna xwe, li gorî pereyên xwe li pêş e, rûmet dibîne. Sed sal berê li vî welatî mirov ne li gorî heyîna xwe, li gorî esaleta xwe, li gorî însaniyeta xwe rûmet didît. Lê îro ev welat hatiye nuqteyeke were ku yek xwedî mal û pere be; bi xwe homoseksûel be, jina wî fahîşe be, kurê wî û keça wî jî wisa... Qet kes guh nadê. Ji bo pereyên wî, giş li dora wî diçin û tên. Djbêjin belkî tiştekî bide me jî... Û mirovekî ku xwedî zanîn û ilm be, lê bêpere be, giş jê direvin...

Ez beriya 12'ê rezberê ji bo serxweşiyê (taziye) çûme Siwêrekê. Kurê Şêx Eyüb wefat kiribû. Şêx Eyüb jî li Amedê bi Şêx Seîd re hati bû bidarvekirin.

Li Siwêrekê teqereq û tevlihevî zêde bû. Di navbera PKK'ê û Bucakan de şer hebû. Dema roj çû ava, heta sibê bû teqereqa tivingan. Bi roj jî leşker ji qişleya xwe derdiketin bi strana "Yaylalar yaylalar" telîm dikirin. Ez rastî zabitekî naskirî hatim, min jê pirsî:

"Ev çi hal e?"

Wiha bersiva min da: "Beriya mehekê Serokê Genelkurmayê Kenan Evren hate vir. Me jê re mesele vekir. Ji me re got, guh nedinê. Ku em bixwazin, dikarin di nav du rojan de wan ji ortê rakin. Lê ji kîjan aliyî bimire, ji me re kar e. İt dişi, domuz derisi!" (Bi gotina kurdan: Serê kêrê, zikê zebeşê)

Ev rast bû. Di ser re mehek, du meh derbas nebû, dest danîn ser îktîdarê û her tişt mîna ku tu bi kêrê bibirî, hate birîn...

Di her derbeyekê de tên, min digirin. Dîsa hatin, ez û pismamên min Mehmet Fuat Firat (vê gav mebûsê Stenbolê ye), Kasım Fırat girtin, birin. Li Erziromê piştî ku bîst roj em di nezaretê de man, em derxistin ba savci, ji me re çi bibêje baş e?

"We sê milyon û nîv pere daye serokê MHP'ê yê navçeya Xinûsê, ji bo ku partiyeke komunîst ava bike!"

Ev mesqere ne, paşverû ne. Çiqas tiştê xerîb û tezat hene dibêjin. Û dema dibêjin, ew bi xwe jî bawer nakin. Ku ez bixwazim partiya komunîst ava bikim, çima kes nema ku ez herim pere bidime yekî ji MHP'ê û avakirina partiya komunîst ji wî dizê hespan bixwazim?

Ji aliyê din ve sê caran em koçber kirine. Sebeb ev dane nîşan: "Hûn mûrtecî ne, rengê we şîn e!"


Süleyman Demirel

Di jiyana xwe de jî, em misilman in. Ne mîna misilmanên wan ên sextekar, Xwedê û pêxember çi gotine, em pê bawer dikin û pê emel dikin.

Divê însan xwedî heysiyet bin. Heta ku ev sîstema derewan ji ortê ranebe, wê ev rezîlet jî berdewam be. Guherîna sîstemê jî pir zor e. Lewra miletê wan jî laîqê vê sîstemê ye. Ji binî reaksiyona wan tune. Yanê were bikeve mala wî, tecawizê erzê wî bike û malê wî talan bike, bibe. Reaksiyon ev e: "Bila canê dewlata min sax be!"

Dema em li Erzeromê girtî bûn, yekî Şawşatî hebû, şêst salî bû. Tim lêdan û heqareta ku lê kiribûn digot. Gelek tişt anîbûn serê wî. Heta yüzbaşiyekî cop xistibûyê... îcar rojekê yekî Qersî teng bû, dema di pencerê de leşker dîtin, got: "Hûn ji me re mêrxas in! Xwezî niha leşkerên Ûris bihatana ka dê we çi bikira!"

Piştî du-sê saetan leşker hatin, gotin yekî ji me re xeber gotine, heqaret kirine. Min pirsî: "Kê ji were got?"

Yê Şawşatî çûye gilî kiriye. Piştî ku leşker çûn, min ji yê Şawşatî re got: "Te çima wer kir?" Birsiva wî ev bû:

"Ben devletime toz kondurmam!" (Ez nahêlim toz li dewleta min bigire!)

Belkî ew cop jê re kurt hatibû... Xwedê dewleta wî bi copê wî ve jê re biparêze!

Di 12'ê rezberê de pir zilm û xerabî çêbûn, lê li ber îro 12'ê îlonê rehmetî ye. Zilma ku îro dibe, di wê wextê de nedibû. Tu destê xwe bavhejî kîjan aliyê vê sîstemê, hildiweşe.

ŞaH Nadir bi mela û alimên xwe dişêwire ku bi awayekî îxtîlafa di navbera şîî û sûniyan de ji ortê rake. Dibêjin, bila li bajarên ku tê de şîî gelek in, rêvebirên sûnî û li bajarên ku tê de sûnî gelek in jî rêvebirên şîî wezîfe bikin ku hev nas bikin, ev dijminayetî ji ortê rabe. Yekî sûnî dikin waliyê bajarê Qûmê. Li Qûmê sûnî pir kêm in.

Walî wê ji katîbê xwe bixwaze ku jê re yekî sûnî bîne, lê ji bo ku şaş neyê fêmkirin "Here ji min re yekî bi navê Omer an jî Ebûbekir bîne" dibêje.

Di navberê de çend roj derbas dibe, katib yekî tîne, dibêje: "Min Ebûbekir anî..."

Walî mêze dike ku Ebûbekir him kor e, him keçel e, him jî topal e... Dibêje: "Kurê min, min got ji min re Ebûbekir bîne, lê ev Ebûbekirê ku te aniye kor e, keçel e, topal e..."

Katib hê di serî de daxwaza walî dizane. Lê xwe li nezanînê datîne: "Waliyê min, av û hewaya vî welatî ji vî çêtir û delaltir Ebûbekiran dernaxîne..."

Yanê sîstem, sîstema derewan e, sîstema zilm û zorê ye. Lê ji nava vî milletî jî tiştê çêtir dernakeve... Milet jî xwe mûsteheqê vî rewşî dike! Ji ber ku dewlet ne îlahî ne, beşerî ne, însan ew çêkirine, bi piranî her

WELAT
Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti. adına
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN YÖYLER

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
MEHMET GEMSİZ

Heyeta Weşanê
(Yayın Kurulu)
AYNUR BOZKURT
SAMİ TAN
RAHMİ BATUR

Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpirsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sok. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL–FAX
(0 212)
251 90 13
ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÛNERÎTIYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
Nimînendeyê Giştî yê Ewrûpayê:
Mazhar Günbat
Suriye: Jan Dost
Helîm Yûsiv
963–21–960099
Berlin:
Silêman Sîdo
49–30–69002695
Hannover:
Selîm Biçûk
49–5721–81360
Munchen:
Mahmut Gergerli
49–871–670884
Bruksel:
Medeni Ferho
32–02–466037
Stockholm:
Robîn Rewşen
46–8–7510564
Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49
Hollanda:
Remzi İlhan
312 06 32 31 28
Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Bila canê dewleta mln sax be!'



A. MELÎK FIRAT

Di 12'ê adara sala 1971'ê de û piştre jî di 12'ê rezbera sala 1980'an de du derbeyên din çêkirin. Pênc general rabûn dest danîn ser îktîdarê. Û bi rastî ku ji min bipirsin, şexsen ez qaîl im ku wan pênc generalan vî welatî îdare bikira... Îro parlemento heye, 550 endamên parlementoyê hene, serokwezîr û serokê komarê heye, lê dîsa jî welat bi quweta generalan tê îdarekirin. Dibêjin "tavsiye", lê hikûmet û parlemento qerarên MGK'ê mîna emir bi cih tînin.
Ka, kîjan "tavsiye"ya wan nebûye qanûn? Yanê ev pêncsed mirovên li parlementoyê fizûlî ne. Her qanûneke xwe bi talîmata MGK'ê çêdikin.

Li Tirkiyeyê her tişt berevajî ye û mîna her tiştî nava peyvan jî vala kirine. Gotinên wan vala û pûç in. Çi dibêjin, di fiîliyatê de berevajiyê wê dikin.

Li yekî dixin, serî lê hûr dikin û vedigerin, dibêjin: "Tu çima serê me hûr dikî?!."

Ji bo vê yekê mînak gelek in: 12'ê rezberê, 12'ê adarê, 28'ê gulanê...

Ji xeynî van, Mustafa Kemal jî bi derbeyê hatiye îktîdarê. Beriya Mustafa Kemal Îttîhat Terakî jî bi derbeyê hatiye; Enver Paşa û Talat Paşa... Ji dema ku tirkan berê xwe dane Rojavayê (xerb) û heta îro tim di nava xwe de derbe çêkirine. Heta hîn ku dest bi teqlîtkirina Rojavayê nekiribûn, hîn bi ûsûla xwe jî bûne, dîsa Yeni Çeriyên wan derbe çêdikirin. Bi gotina wan "Kazan Kaldırmak" çêdikirin.

Mesela, di 12'ê rezberê de Kenan Evren derbeyek ji silsîleya derbeyan çêkir. Dest danî ser îktîdarê, partî girtin û çawa ku telîm bi leşkeran didine kirin, wer bi milet û bi siyasetvanan telîm dane kirin. Û di qişleyên wan de jî navê leşkeran bi tevayî "eşekoğlu eşek" e. Leşkerên xwe bi kutan û lêdanê, bi heqaret û xeberan perwerde dikin. Milet jî bi vî awayî îdare kirin.

Lê rastiyeke din jî heye ku divê mirov heq bide wan. Gelê vî welatî ji sedî not, heta not û pênc, kêfa wan ji zept û reptê re tê, alîgirê dîktatoriyê ne... Dema di navbera wan de nexweşiyek derdikeve, meseleyên xwe bi nîqaş û danûstandinê nikarin çareser bikin. Gazî leşkeran dikin: "Ey leşker, tu li ku derê yî, were welat xelas bike!"

Leşker ji xwe re kirine "xelaskar", hê ji wexta osmaniyan ve li ser vê yekê tabîreke wan heye: "Xelaskar zabîtan".

Beriya şêstî, li vî welatî ha baş û ha xerab îktîdareke ku ji aliyê milet ve hatibû hilbijartin hebû. Leşkeran bi fetwaya İsmet Paşa derbe çêkirin û di serî de serokê komarê, hemû kesên ku li îktîdarê bûn girtin, birin avêtin Hepsa Yasiadayê. Ew zîndanên Bîzansan bû, ji wê demê ve maye. Mehkemeyn wan komedî bû. Sosret bû...



Kenan Evren

Mehkemeyek bi navê "Edaleta Bilind" ava kirin, lê di rastiya xwe de ev "Rezîleta Bilind" bû... Têkiliyên wan qet bi edaletê re tune bû.

Reîsê Mehkemeyê Salim Başol digotinê, bavê wî mirtib bû. Ji bavê wî re digotin "Çingene Şevket", dema ku Samet Ağaoğlu "Tu têkiliyên van tiştên ku hûn dikin bi hiqûqê ve nîn e, ne bi hiqûqa Tirkiyeyê ve û ne jî bi hiqûqa beynelmînel ve " got, Salim Başol Yozgatî bû nikaribû bigota "tıkan", di cihê "tıkan"ê de digot "tıxan", bi eşkere got: "Sizi buraya tıxan kuvvet, böyle istiyor!" (Ew hêza ku hûn xistine vir, wiha dixwaze!)

Îcar di îdîianameya xwe de digotin: "We li hikûmetê derbe çêdikir, lewre me dest danî ser îktîdarê!.." Û li ser vê esasê milet ceza kirin.

Ev çawa çêdibe? Tu vê ji keran re jî bibêjî, ku nizanibin bikenin jî, wê bizirin!..

Serokê komarê, serokwezîr, temamê wezîran û parlamento... Gelo ji xeynî van di komarekî de hikûmet heye? Ku ne ev bin, hikumet kî ye? Yanê ji hikûmetê re digotin:

"We hikûmet werdigerand, emê ji bo vê yekê jî we îdam bikin!.."

Ev sîstemekî wiha ye, dîqet bikin; ji xwe re jî wiha ne...

Di 12'ê adara sala 1971'ê de û piştre jî di 12'ê rezbera sala 1980'an de du derbeyên din çêkirin. Pênc general rabûn dest danîn ser îktîdarê. Û bi rastî ku ji min bipirsin, şixsen ez qaîl im ku wan pênc generalan vî welatî îdare bikira... Îro parlemento heye, 550 endamên parlementoyê hene, serokwezîr û serokê komarê heye, lê dîsa jî welat bi quweta generalan tê îdarekirin. Dibêjin "tavsiye" lê hikûmet û parlemento qerarên MGK'ê mîna emir bi cih tînin. Ka, kîjan "tavsiye"ya wan nebûye qanûn? Yanê ev pêncsed mirovên li parlementoyê fizûlî ne. Her qanûneke xwe bi talîmata MGK'ê çêdikin.

Her ku wiha ye, bila ew pênc general rûniştana û teqawit jî nebûna, heta mirinê welat îdare bikirina. Qene ev çend riyakarî û durûtî çênedibû, mirov dizanibû yên li îktîdarê kî ne. Ne ku ez hereketa Evren Paşa teswîp dikim, ji xwe giş rezalet e... Lê Evren sed car ji Demirel çêtir e. Derveyê wî û hundirê wî yek e...

Ev bi tu tiştekî ve ne girêdayî ye. Ez tim dibêjim; xwezî ev xirîstiyan bûna, baweriyeke wan hebûya, dînê yahûdiyan bihebandana, an jî brehmen, bûdîst bûna, baweriyeke wan hebûya. Qet tiştekî wan, baweriyeke wan tune. Hema çer kêfa wan bixwaze, îhtîrasa wan, şehweta wan çi be, wî dikin.

Di destê wan de sê distûr hene: Zilm e, talan e, derew e...

Ha leşkerên wan û ha sivîlên wan... Di nav wan de tu ferqiyet tune. Sîstem wer berepaş dixebite ku şexsiyet namîne.

Fikir namîne...

Anor namîne...

Heysiyet namîne...